
# RASTIYA ZIMAN, WÊJE Û ÇANDA KURD



## ABDULAH OCALAN

3

**Weşanên Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî**

# ABDULAH OCALAN

# RASTIYA ZIMAN, WÊJE Û ÇANDA KURD

**Weşanên Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî**

**Abdulah Ocalan**
**Rastiya Ziman û Wêjeya Kurdî**

Weşanên Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî

Ciyê Çapê: Çapxaneya Azadî
Dîroka Çapê: Adar 2007

## Naverok

Pêşgotin 6
Dîroka Rastiya Ziman û Çanda Kurd 10
Li Ser Çanda Kurdistanê Polîtîkayên……….

Asîmîlasyonê Yên bi Darê Zorê 22
Hebûna Çandî Ziman Pêkan e 27
Tevkujiya Çandî ji Ya Fîzîkî Xirabtir e 31
Zimanê Kurdî Tevkujiyekê Dijî 34
Divê Ji Bo Zimanê Kurdî Cihên Azad….
…….Werin Afirandin 38
Tenê Nivîskariya bi Zimanê Kurdî Têr Nake 43
Roja Ronesansa Kurd Hatiye 44
Wêje Giyana Civakî ye 48
Destpêka Romanê Pêwendî ye 54
Divê Evîn Weke Têgîneke Bingehîn ……
…..A Wêjeyê Were Hizirîn 67
Pêşvexistina Hezkirina Kurd Peywira …..
….. Wêjeya Kurd e
70
Serkeftina Evînê Serkeftina Gel e 71
Ji Pirsa "Çawa Bijîn" re Bersiva Rast Roman e 77
Divê Romana Kurdistanê Xweser Be 82
Romana şoreşgeriya Kurd rasteqînêr e 90
Bilindbûyîn
96
Wêje hîmê giyanê ye 102
Mêtîngerî Hunerê jî înkar dike 105

## Pêşgotin

Pirtuka Rastiya Ziman, Wêje û Çanda Kurd ji gelek pirtuk, dahurandin û gotarên Serokê KKK (Koma Komalên Kurdistan) birêz Abdulah Ocalan hatiye berhevkirin. Lewra ev pirtûk bi ked û xebateke demdirêj hatiye pê.

**“Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hînî zimanê xwe yê dayikê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne?”**

Ev hevok pir bi zelalî û eşkere ji me re nirx, wate û giraniya zimanê zikmakî diyar dike. Ger mirovek nikaribe bi zimanê xwe yê zikmakî biaxive û nikaribe zarokên xwe hînî zimanê xwe yê zikmakî bike, gelo ma wê demê çi wateya jiyana mirov dimîne. Ger mirov neçarî zimanekî din were hiştin, ji ber axivîna zimanê xwe yê zikmakî bi salan di girtigehan de birize, ma çawa dikare jiyana xwe bidomîne û watedar bike. Lewra ji bo watedarkirin û bi şanazî domandina jiyana xwe tekoşîna hebûnê hewce dike. Ev tekoşîn him ji bo azadiya axivîna bi zimanê xwe yê zikmakî, him ji bo hunandina wêjeya xwe ya bi zimanê xwe û him jî ji bo jiyîna bi çanda xwe ye. Gelo îro çend kes ji me Kurdan dikarin bi azadî bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin, binivisînin û bixwînin? Çend kes ji me dikarin bêyî bedêl û zoriyan li gor çand û nirxên xwe yên gelerî bijîn? Ma ev ne mafên me yên xwezayî ne û hemû ji destên me hatine stendin? Vaye pirtuka Rastiya Ziman, Wêje û Çanda Kurd hindekî jî riya tekoşîn û bidestxistina van mafan destnîşan dike.

Ziman, wêje û çanda Kurdistanê, rexmî ku ziman, wêje û çandeke herî dewlemend a cîhanê ye, ji destpêka dîrokê hetanî roja îro jî her dem bi çewisandin, talan, qedexe û asîmîlasyonan ve rûbirû maye. Lê ji ber kok, dînamîk û qayimiya xwe, weke hemû serdemên ku bi çewisandin, talan û asîmîlasyonan ve

rûbirû maye, îro, yanî di destpêka sedsala 21. de jî şarezayiya xwe ji piyan girtinê raberkiriye û hebûna xwe domandiye.

Bi pêşveçûn û mezinbûna şoreşa vejîna gelê Kurd re, her wiha di warê ziman, wêje û çanda Kurd de jî vejîneke bêhempa hatiye jiyîn û ketiye ser qanaleke pêşketinê ya xurt. Lewra di gelek waran de ji ziman û çanda ku di nava pêlên dijwar ên asîmîlasyona serdestan de diperpitî gelek berhemên giranbiha û nirxdar hatin afirandin. Van berheman bi gelek aliyên xwe ve ji derdoreke pir fireh re da peyitandin ku, ziman û çanda Kurd hîna li ser xwe ye û dê bikaribe wisa berhemên nirxdar jî biafrîne. Rast e, gelek tişt bi vî zimanê hatine pê, û hindek serketin jî bi dest ketin, lê gelo ma ev ji bo zimanekî weke Kurdî bes dikir? Bêguman na! Vaye di vê xalê de Serokê KKK'ê birêz Abdulah Ocalan, weke ku di vejîna tekoşîna nû ya azadiya Kurdistanê de kiriye, dîsa ji me xwendewanan re azîne û rêbazên pêşvexistin û mezinkirina ziman, wêje, çand, perwerde ûhw destnîşan dike ku, divê em çawa bikaribin, bi zimanê xwe, bi nexşên çanda xwe rewş, derûnî û rastiya civaka xwe bînin ser ziman ku, bikaribin civakeke ronak, zana û afirandêr biafrînin.

Esas a ku di vir de tê xwestin baş were ditîn û were naskirin, azîneya rast a ronakirina gel e, lewra weke mînak ji vê yekê re berhema Fîlozofê mezin Ehmedê Xanî Mem û Zîn tê raberkirin. Her wiha di vir de tê xwestin balê bikişîne ser pirsgirêkên yekbûn û netewbûna gelê Kurd. Ji lewra dide zanîn ku çawa beriya niha bi 300 salan feodalî û paşverûtiya begitî yan jî mîrîtiyan li pêşiya yekbûn û netewbûna Kurd bû asteng, îro jî heman sedeman dadihurîne û azîne û hêza netewbûnê diyar dike. Çawa ku Ehmedê Xanî di destana Mem û Zînê de bi kesayeta Beko ve rastiya vê paşretî û bêyomî tînê ziman, her

wiha bi kesayeta Tacdîn û Stiyê jî dilpakî, wêrekî û fedekariya gelê Kurd bi lêv dike. Ji lewra birêz Ocalan jî heman kiruyan bi taybetmendiyên Kurd ên îro ve dadihurîne û riya çareserî û serxistina yekitî û netewbûna Kurd a demokratîk berpêş dike.

Di nava rûpelên vê pirtukê de ji çawaniya evîna Kurd re jî li bersivê tê gerîn û ev yek di evîna Derwêşê Evdî û Edulê de şênberiya xwe dibîne. Lewra ya girîng jî gelaleya romana Kurd a serkeftî pênase dike û çawaniya vebêja rastiyên jiyana Kurd tîne ser ziman.

Di hundirê pirtûka Rastiya Ziman, Wêje û Çanda Kurd de rastî ji destpêka dîroka Kurdan de tê bidestgirtin û hetanî roja me îro tê. Weke ku pirsgirêkên bingehîn ên Ziman, Wêje û Çanda Kurd tên şîrovekirin her wiha çareserî jî tê ravekirin. Birêz Ocalan di vê pirtukê de tenê pirsgirêken çanda Kurd bi lêv nake, her wiha pirsgirêken vejandina çandên hemû gelên Mezopotamyayê –Ermen, Asurî, Keldanî ûhw.- tîne ser ziman û jê re riya çareseriyê destnîşan dike.

Em hêvîdarin pirtûka Rastiya Ziman, Wêje û Çanda Kurd bi naveroka xwe ya dewlemend, hînkar û rasteqîn ve bibe roniya hezkar û tekoşînvanên Ziman, Wêje û Çanda Kurd.

**Komîteya Ziman û Perwerdeya Kurdî**
**Rebendan 2007**

***Ya ku bi salane li ser Kurdan tê sepandin, di wateya siyasî de mêtîngerî, di wateya aborî de birsîtî, bêkarî, xêzanî û talan, di wateya çandî de asîmîlasyon û tevkujî û di wateya leşkerî de jî dagirkerî ye.***

# Dîroka Rastiya Ziman û Çanda Kurd

Wexta ku em Kurdan û komên din weke hindekayiyan bi nav dikin û Kurdistanê jî weke welat destnîşan dikin, bêguman bi vê yekê re hindek zehmetî derdikevin holê. Li erdnîgariya Rojhilatanavîn têgeha welat bi gelek awayên cewaz ve tê destnîşankirin. Eger em ji serdema navîn ve dest pê bikin, tarîfên welat ên li ser hîmê olî zêdetir in; weke Diyarê Îslam, Diyarê Kafiran. Li gor qewm û etnîsîteyê jî cihebûn hatine kirin, lê sînorên wê zêde zelal nînin. Dema sînorên komeke etnîk û qewm were pirsîn, bersivên werin dayîn zelal nînin. Bi giştî cih û warên mayinê yên eşîr û qewman têne diyarkirin. Li gor pêkhatineke siyasî nînin. Pêkhatinên siyasî zêdetir bingehê wan bajar in. ji lewra erdnîgariya wan a lê bi bandor jî bajar in. Cih û warên eşîran jî zivistan û havînan diguherin. Sînorên Ereb, Tirk, Kurd, Fars û qewmên hînê di astên jêr de li gor çand û zimanên diaxivin, têne destnîşankirin.

Di bingehê têgeha Kurdistanê de peyva “Kur” radize û ev peyv bi koka xwe Sumerî ye. Di zimanê Sumerî de Kur tê wateya çiya yan jî koh. Daçeka “tî” jî aîdiyetê îfade dike. Bi vî awayî gotina Kurtî tê wateya qewmê çiyayî. Em ji BZ dikarin heta 3000 salan paş ve biçin. Em li wir dibînin ku hindek navên din jî hatine bikaranîn. BZ di salên 1000’an de cîranên wan ên başûr Luwiyan ji herêma Kurdistanê re bi wateya “welatê gundan” peyva Gondwana bi kar anîne. Gond di zimanê Kurdî de hîna jî weke gund tê bikaranîn. Di dema serdestiya Asuriyan de peyva Naîrî bi wateya xelkê çem dihat xebitandin û heta em dizanin ku di navbera Dîcle-Zê de Federasyona Naîrî hatiye avakirin. Ji bêşa wê ya

dorfireh re peyva welatê Med, Madaîn, Maden hatiye bikaranîn. Di demên serdestiya Asuriyan de BZ di navbera salên 1300-1600'an de em dibînin ev peyv û nav bi awayekî berfireh hatine bikaranîn. Em peyva Urartu jî dikarin bi heman analîzê bibêjin ku Urartu tê wateya cihê bilind, welatê bilind û welatê zozanan. Ji ber ku Sumer li Mezopotamya Jêr diman timî navên bilindahiyê îfade dikin, li zozanê Kurdistanê kirine. Peyva Hûrî jî bi ihtimaleke mezin ji heman çavkaniyê tê. Tê wateya xelkê welatê bilind. Yanî dîsa bi wateya qewmê çiyê ye. Komagenes bi koka xwe bi navkirineke Helenî ye. Qraliyeta Komagene BZ li derdora 250 û PZ sala 100'an li Semsûra îro jiyaye. Peyva kom hînê jî ji bo komên nîv-koçer û cîhûwarên wan bi wateya zom tê bikaranîn. Peyva "gen" jî bi wateya nîjad, qebîle û eşîretê tê. Komagene tê wateya diyarê eşîrên nîv-koçer.

Di serdema navîn de, di dema seretayî ya Siltanên Ereb de peyva "beled- El Ekrad" bi wateya herêma Kurdan tê bikaranîn. Siltanên Selçuqiyan ku bi Farsî dipeyivîn, bi wateya îro bû diyarê Kurdan peyva Kurdistanê bi awayekî fermî yekem car weke xwediyê dewletê bi kar anîn. Piştre Siltanên Osmaniyan, nemaze bi dema Siltan Yawuz Selîm re peyva hikumetên Kurdistanê û eyaletên Kurdistanê pir tê bikaranîn. Bi zagonameya çolteran a di asla 1848 û 1867'an de eyaletên Kurdistanê fermî tên avakirin. Di serdema meşrutiyetê de mebûstiyên Kurdistanê têne tesîskirin. Mistefa Kemal di salên 1920'an de gelek beyaname û fermanên naveroka wan Kurd û Kurdistan dane. Polîtîkaya înkarê bi awayeke fermî zêdetir piştî tepisandina serhildana

bi polîtîkayên asîmîlasyonê ve pêş ketiye. Bi nameya welatê Kurd û Kurdan, Kurdistan, belkî jî weke welat û xaka herî kevin ê dîrokê xwedî cihekî cewaz e. Ji bo navê wê were hildan. Lê em wexta ber bi roja me ya îro ve tên, ji wateya siyasî wêdetir bi wateya jeo-çand tê bikaranîn. Bi biryandina ji bo damezrandina welatê federe ya Kurdistana Iraqê, êdî peyva Kurdistanê dê bi wateya siyasî jî pir caran derbikeve pêşberî me. Ya girîngtir, bi bûyerên siyasî yên PKK re rê li ber wan vekiriye, Kurdistan jî peyveke wêdetir weke têgeheke siyasî û civakî di qada navnetewî û herêmî de bi awayekî berfireh hatiye naskirin.

Ravekirin û terîfeke civaka Kurd hîna hêsantir e. Gelê Kurd û heywan xwedîkirin, cotkarî û çiya heman tişt in. bajarvanî weke têgeh ji Kurdan dûr e. Belkî jî gunditî di dîrokê de rastiyeke civakî ye ku pêşiyên Kurdan pêk anîne. Kurd çendî gundî û koçer bin, ew çend jî ji bajarvaniyê dûr in. Komagene pir baş rave dike ku nîv-gundîtî nîv-koçertî nîzama tevgerê û cihûwarê hezar salan a Kurdan e. Bajarên wan jî zêdetir, dagirkeran ava û tijî kirine, lê ev yek nayê wê wateyê ku Kurdan bajar ava nekirine û nebûne xwediyên şaristaniyan. Di serî de dewletên Urartu, Med û Mîtan, tê zanîn ku bûne xwedî gelek bajar û şaristaniyan. Di serdema navîn de têra xwe bajar û hikumetên eyaletan avakirine. Lê ji ber ku dewlet û hikumdarên ku avakirine, temendirêj nebûne, bajar zêdetir bûne biryargehên hêzên dagirker û ji civakên hawirdorê pêk hatine. Di serdema seretayî de Sumer, Asur, Aramî, Pers û Helen bandora muhra xwe li ser berhemên çandî û nivîskî dixînin. Lê di serdema navîn de ziman û çanda Farisî û Erebî şopên xwe hiştine. Gelek

rewşenbîr, dewletdar û fermandarî bi vî ziman û çanda cîran ve rol lêyîstine. Tevî ku çand û zimanê Kurdî hîm û kokeke wî ya kevnare heye jî bi sedema ku kêm bûye zimanê nivîsê û nebûye zimanê dewletê, nekariye belgeyan li dawiya xwe bihêle û bi pêş bikeve. Dîsa jî çanda Kurdî bi riyên cuda, bi hebûna xwe ya etnîk a dijî û berhemên dîrokî heta roja me ya îro tê. Çand û zimanê Kurdî, bi ihtimaleke xurt ku –gelek arkelog vê dîtinê rave dikin- weke çand û zimanê yekemîn şoreşa neolotîkê li quntara çiyayên Zagros-Toros daye destpêkirin. Bi demê re bingehê hemû çand û zimanên koka wan Hint-Ewrupayî ye, pêk aniye. Tê texmînkirin ku, BZ ji salên 9000'an pê ve ne bi fîzîkî, lê bi awayekî çandî li erdnîgariya Hint-Ewrûpayê belav bûye. Em pêkhatinên wê bi xwe jî BZ 15.000-10.000'an bi ihtimaleke mezin, bi derketina ji çaremîn serdema qeşayî (BZ 20.000-15.000) weke ziman û çanda herî otoktan –xwecih- pêk hatiye. Etnîsîteya Kurdî BZ bi salên 6.000'an de êdî pir cihewaz dike. Em li ser dika dîrokê yekem car wan bi navê Huriyan (BZ 3000-2000) dibînin. Sumerî li ser daristan û madenên xwe, nifşên Huriyan jî bi dewlemendiya xwe ya şaristaniyê bi hezarên salan bi tekoşîneke eşîr-parastinê li ber hev dane. Ev diyalektîka dîrokî bi Babîl, Asur, Hîtît, Îskît, Pers û Helenan re dewam dike. Belkî jî tu qewm û nifş bi qasî Kurdan di eşîrên beramber ên koçer û bicihbûyînê de cih negirtine. Ji bo şaristaniya Sumeran bigihê, Hîtît, Luwî, Îon û Persan rola Hurî û Medan diyarker e. Ji ber vê rastiyê, ku gelên behsa wan tê kirin, nêz-dûr ji koma zimanên Hint-Ewrûpa ne.

Di dîroka Heredot de pir eşkere tê dîtin ku ziman û çandan bandora xwe li Helenan kirine, çavkaniyên wî Medî ne. Helenî BZ hetanî salên 900-400'an pir zêde di bin bandora Medya de jiyane. Gelek hêmanên çandî yên madî yên manewî di vê serdemê de ji çavkaniyên Urartu, Med, Persan wergirtine û bi senteza xwe ve dewlemend kirine. Tê texmînkirin ku pêşiyên Kurdan Hurî (BZ 2500-1500) dîsa Mîtaniyan bi koka xwe Hurî (1500-1250) Naîrî (BZ 1200-900) Urartuyî (BZ 900-600) Medî (BZ 700- 550) di van deman de bi konfederasyonên eşîr û qraliyetan ve jiyane. Civaka Kurdan a di van deman de hiyerarşîk e û derbasî dewletê dibe. Mirov çav didêre ku nîzamekî xurt ê bavikanî danîne. Ji ber ku di serdema neolotîk a cotkariyê de jin hîna çalak e. Di civaka Kurdan de jin xwedî giranî ye. İhtimaleke xurte ku jinê ev hêza xwe demeke dirêj bi kar aniye. Bingehê wê şoreşa cotkariyê ye. Hêmanên mêbûnê yên di ziman de û kulta xwedewendiyê de starê belge yên ku heqîqetê piştrast dikin.

Zerdûştî BZ bi salên 700-550'an de weke şoreşeke zîhniyeta Kurdan pêş ketiye. Zîhniyeta Zerdûşt xwe dispêre cotkariyê; ji heywanan pir hez dike, li ser hîmê wekheviya jin û mêr e, weke têgihiştineke exlaqî ya azad e. Ev çandek e, him bi cihoka Persan ve diherike Rojhilat him jî bi cihoka Heleniyan ve diherike şaristaniya Rojava û bandoreke xurt li wan dike. Li ser xeta çanda Rojava-Rojhilat ji hev dibe. Bandoreke xurt li ser herduyan jî dike û di teşegirtina şaristaniyê de herî kêm bi qasî Musevîtî û Îsevîtiyê rola civakbûnê lêyîstiye. Şaristaniya Persan, a rastîn şaristaneke ku Medan avakiriye û şaristaniyeke Med-Persan e û tevî

nifşên Persan dewam kiriye. Di dîroka Heredot de ev rastî pir eşkere diyar dike. Ji serî hetanî dawiyê etnîka duyemîn e, hevparê împaratoriyê ye. Di dema Sasaniyan de jî heman rewş didome. Di heman şaristaniya Îranê de heke mirov rola Kurdan di rêza duyemîn de nebîne, wê helwesteke realîst be.

Pêşiyên Kurdan di serdema seretayî de nîzama baviktiyê pir xurt dijîn. Lê cihêbûna çînayetiyê kûrahiyê ne jiyane. Tevî ku hiyerarşiya wan xurt bû, cihebûna çînan qels bû, ev yek jî bandora eşîrî ya koçeriya li ser çiya ye. Komên eşîr – qebîleyên weke komên xizman di nava xwe de keys û firsendê nadin pêşketinên koletiyê. Jixwe koletî zêdetir berhemeke bajarvaniyê ye. Di civaka Kurdan de hêmanên folklorîk zêdetir destanwarî ne. Ji ber ku destan bi giranî qehremaniyan tîne ziman, bi ihtimaleke mezin ji serdema hiyerarşîk mane. Kokên awazên di destanên Mem û Zîn, Memê Alan û Dewreşê Evdî de hetanî bi muzîka Sumeran diçin. Dîsa ihtimaleke mezin e, bi cihoka Sumeran ji nifşên Huriyan BZ di salên 4000’an de digihê me û afirênêriyeke wan e. Nîzama Muzîk û lîstikên Kurdan, li Rojhilatanavîn çanda herî zêde gurr û xwedî nirxên hûnerî ye. Mirov hebûna dîrokî ya Kurdan herî zêde dikare di muzîk û govenda wan bibîne. Dîsa mirov bi heman awayî dikare bi çavdêriya li sekna jinê, di kinc, lixwekirin û şêwazê wê de, di tenikiya rûnîştin û rabûna wê de bibîne. Esaleta nifşên Kurd çavkaniya wan serdema seretayî ye. Xwezaya tune de, çiya, berxwedana li dijî dagirkeriyê, domdar û bêrihm dîrokeke demdirêj di pêkhatina vê esaletê de xwedî roleke bingehîn e.

Em difikirin ku bi ketina serdema navîn re dema Helenê şop hiştine. BZ di salên 300'an de Abgara navenda wan Urfa, Komagene navenda xwe Semsûr, Samosat û milkiyeta Palmîra ya li Suriyê xwediyê heman taybetiyan e û di bin tesîrên xurt ê Helenan de ne. Ya rastîn, di dîrokê de yekemîn mînakên herî delal ên senteza Rojhilat – Rojava pêk anîne. Ev şaristaniyên ku heta fetha Romayê dewam kirin –herî dawî ketina Palmîra BZ di 269'an de ye- qonaxa herî girîng a pêşketina li herêmê temsîl dikin. Berhemên dîrokî yên li Palmîra, Nemrût û Urfayê ji wê demê ve mane. Ev şaristanî tekîliyeke wan a zêde bi Kurdan re heye. Di wê demê de em dibînin ku du ziman Aramî û Helenî weke hevrikên hev derbikevin pêş. Li hemberî van şaristaniyên serdest ên zêdetir bazirganiyê re mijul dibin, Kurd jî zêdetir bi cotkarî, koçeriyê ve hawirdora xwe ava dikin. Berhemên vê yekê nîzama hetanî roja me ya îro dewam dikin heye. Xerîbtiya navêndên bajar û Kurdîtiya gund û koçertiyê mîna dualîteyeke diyalektîkî ne.

PZ di serê sedsala 3. de împaratoriya Sasanî derket holê û di nava wê de jî giraniya Kurdan neguherî. Zerdûştî bingehê îdeolojîk bû. Xwe spartibûne, nûbûna wê ew e, PZ di salên 210-276'an de Manî dike pêxember, ji hemû dînan Manî dixwaze sentezekê biafrîne û pê zîhniyeta bingehîn a împaratoriya Sasanî û Romayê bihûne. Her wiha pê re aştî û ronesansekê pêk bîne. Lê li xezeba rahîbên Zerdûştî yên mihafazakar diqelibe û tê kuştin. Dîsa weke xeteke xurt a zîhniyetê heta roja me ya îro şopa xwe hiştiye. Belavbûna Xiristiyaniyê jî rastî vê demê tê. Nemaze di serî de Urfa û Nisêbînê re –Nizîbîs- weke navendên xurt ên Xiristaniyê

bandorê li ser Kurdan dike. Hindek cih dibin Xiristiyan, lê hebûna Zerdûştiyê li cem Sasaniyan serkeftinek e. Tam a Xiristaniyê asteng dike.

Em dikarin texmîn bikin ku avahiyên feodalîzmê li cem Kurdan di dema Sasaniyan de (PZ 216-652) pêş ketine. Mirov dikare Manîtiyê weke Îslama zû hatiye, binirxîne. Manî bi xwe Hz. Mihemedê zû hatiye dinyayê ye. Lê bandora şerên dijwar bi navbera împaratoriya Sasanî û Romayê de nemaze li ser xeta Amed, Nisêbîne bi salan dewam dike. Berovajî dema Helenîstîk civak rûyê pêşketina rihetiyê nabîne. Di navbera Xiristiyaniyê û Zerdûştiyê de hevriyek bûye. Nesturîtî ekolek e Xirîstiyaniyê ye, di bin bandora Sasaniyan de weke navrikek tevgeriyaye. Xirîstiyanî nasnameya Suryantiyê werdigre, bi vî awayî di vê demê de têra xwe bi liv û tebat dibin. Nexasim gelek xebatên qîmeta wan a arşîvê heye kirine. Di belavbûna Îsewiyetê de ji Grêkan zêdetir rol lêyîstine. Gelek psîkopos perwerde kirine û gihandine. Texmîn tê kirin ku, wêjeyeke xurt derxistine. Li Urfa, Nisêbîn û Sêrtê akedemiyên pêşketî avakirine. Di avakirina navenda zanistê ya gundî Şahpûra Sasaniyan para wan li ber çav e. Zimanê Aramî weke zimanê hevpar bandora xwe dewam dike. Grêkî ber bi Rojava qada Bîzansan ve diçe. Aramî li Rojhilat dibe zimanê serdest ê bazirganî, wêje û olî.

Em dikarin texmîn bikin ku Kurd di vê demê de (PZ 250-650) kevneşopiyên xwe yên feodal pêş de birine û di vî warî de civakê xwe veguhertiye. Pêşketina feodalîzmê cihêbûna di avahiya etnîkî de jî nîşan dide. Di civaka Kurdan de tayên feodaliyê her ku diçe xurtir dibin. Di serdema pêşketina

şaristaniya feodalîzmê de şoreşa îslamê dikeve rojevê. Ya esas, îslamiyet têkîliyên tund ên koletiyê û tayên etnîk ên li pêşiya pêşketinên kelem in. Li ser hîmê bajarbûnê vediguherîne û nîzameke hîna pêşketî, civaka feodal li ser bingehê şoreşa zîhniyetê û îdeolojîk ava dike. Ya li Ewrûpa, Hind û Çînê bi tekamuliyet û beridandinê pêk tê, li vir bi riya şoreşan ve diqewime. Îslamiyet di şaristaniya Rojhilata navîn de şoreşa herî mezin e. Hema hetanî sedsala 12. di pêşketina civaka feodal de rola avakirina polîtîka û îdeolojîk dilêyîze.

Bi hilweşandina Sasaniyan re (PZ 650) îslamiyet di nava Kurdan de jî bi lez belav dibe. Arîstokrasiyeteke feodal diafrîne. Hêzên dewletparêz û hiyerarşîk ên Kurd di bin bandora Erebkirineke xurt de vediguherinîn û di vê demê de dibin yek û ji komên herî xurt a siyasî û civakî. Bi xanedaniya Eyûbiyan a Kurd (PZ 1175- 1250) xanedaniya herî xurt a siyasî li Rojhilata navîn pêk hatiye. Di nava Kurdan de jî têra xwe bi tesîr bûne. Li aliyê din, Siltaniya Selçûqiya ya ji Ebasiyan PZ di salên 1055'an de împaratorî wergirt, bi Kurdan re jiyaye. Hîna jî mîna Kerkûkê ev jiyana hevpar bêşer derbas bûye. Dewletên feodal ên bi koka xwe Kurd mîna Şedadî, Kurê Bubeyhan û Merwanî (PZ 990-1090) pêşketine. Her wiha gelek Begitî û hikûmetên Kurd hatine damezrandin. Kurên Şerefxan ên navenda Wan, Bêdlîs bû, begitiya herî demdirêj ava kirine. Vê begitiyê hetanî dema Siltan Qanunî Silêman hebûna xwe domandiye. Taybetiyên civaka feodal rê li ber veguhertineke girîng a zîhniyeta civaka Kurd vekirine. Şop û bermahiyên Zerduştiyê ji bilî li cem Zerduştiyan –Yêzîdiyan- tune bûne.

Bi ihtimaleke mezin ev guherîn bi pêşketina hevkarên Kurd de xwedî roleke dijşoreşê ye.

Li bajarên dibin Misilman zimanê Erebî xwedî bandor e, lê dîsa jî di çand û zimanê de Kurdî de paşketin nîne. Yekemîn tomarkirinên destanan bi awayekî nivîskî weke Ehmedê Xanî di vê demê de derketine rastê. Çanda bi islamê nuximandiye, mîna li cem her koma etnîk hatiye dîtin, li cem Kurdan jî pir kûr rihên xwe berdane. Tevî vê yekê li Başurê Kurdistanê bi eşîrên Ereban re –nemaze Şemaran re hetanî roja me ya îro- şer timî dewam kiriye. Destana Derwêşê Evdî, destana van şeran e. Ev destaneke şopên xurt ên çanda Kurd nîşan dide û di koka xwe ya Zerduştiyê de israr dike. Tê texmînkirin ku ev bûyer di sedsala 18'an de qewimiye. Di nava îslamê de Zerduştiyetî mîna çandeke tekoşêr û berxwedaniyê ye. Berxwedaniyeke resen û esl a çanda Kurd e, li dijî biyanîbûn û xerîbketinê. Elewîtiya qels û xwe bi îslamiyetê nixumandiye û alîgiriya Hz. Elî dike. Piştî Zerduştiyê çanda Kurdan a herî tekoşer e, mîna Şîatiya Kurd be. Li beramberî vê yekê, nemaze Kurdên başur ên nêzî deştê bi baweriya îslamê ya Sunî dibin xwedî karektereke hevkar û paşverû. Ev derdorên xwedî zîhniyeta bazirgan-feodal çanda nifşên xwe înkar dike. Nûnerên vê zîhniyetê ku li herêmên nêzî Urfa, Mêrdîn û bajarê Sêrtê di nava îxaneteke super de ne. Pir bi awayekî seyr û ecêb hevkar in û berjewendperestin. Kurdên di bin bandora Îranê de hîna kêmtir xirab bûne. Cewherê xwe yên netewî hîna bi awayekî otantîk diparêzin.

Yên Tirk- Kurd de ne. Ji şer dûr in. Bi bandor Bîzansan jî piştgiriya hev dikin û di nava têkîliyên dostane de ne.

Xiristiyaniya Ermenî û Suryaniyan jî di vê yekê de roleke girîng lêyîstiye. Şerê Melazgirê yê 1071'ê di cewherê xwe de şereke ku xwe dispêre îtîfaqa Kurd-Tirkan. Eger Siltan Alparslan xwe nespartibûya Kurdan pêkan nebû bibûya xwedî serkeftinê. Di vê demê de êşîrên Tirkmenan ên di nava nifş û çanda Kurdî ya bi cihbûyî de, li asîmîlasyoneke girîng rast hatiye. Vê pêvajoyê hetanî dawiya sedsala 19. dewam kir, bi komarê re berovajî dageriya.

Kurdên bi tevahî dikevin bin bandora çanda feodal a serdema navîn, çendîn çînîbûyîna feodal dijîn ew çendê di jiyana azad de paş ve dikevin. Koletiya feodal timî li dijî azadiya eşîrtiyê pêş ketiye û di xerîbketina zihnî de qonaxeke girîng pêk tîne. Tevî gelek rewşenbîrên îslamê yên Kurd gihiştine jî, ji ber meylên dewletê yên hevkar nekarîne bandoreke mayinde bikin. Di serê pesindar û hevkarên dewletê de Îdrîsê Bedlîsî tê. Li Çewlikê di hilbijartinên herêmî yên herî dawî sala 2004'an de komeke koka wan terîqeta Neqşîbendî –terîqeta Şêx Seîd- diruşmeke pir balkêş qêrîyane. "Îdrîsê Bedlîsî li vir e, Yawuz Selîm li ku ye!" mirov dikare li bendê be ku serokwezîr Erdogan rola Yawuzekî duyemîn bilîze. Eger xiyaneta Neqşîbendiyê bi tevahî li Kurdistanê neyê nirxandin şensê şoreşa ronîbûnê nîne. Li beramberî vê, ronîbûna Elewiyan bi koka xwe Kurd hîna erênî bûye.

***Yê ku qeyd û kelepçe li zimanê wî hatibe xistin, li mejiyê wî, dilê wî nerîna wî jî qeyîd û kelepçe hatiye xistin.***

# Li ser Çanda Kurdistanê Polîtîkayên Asîmîlasyonê yên bi Darê Zorê

Yek ji polîtîkayên civakî yên blokên îqtîdar û şer, herî zêde serî lê dane polîtîka asîmîlasyonê ye. Bi gotineke giştî asîmîlasyon, helandin û bişaftina çandê ye. Blokên îqtîdarê û şer bi polîtîka asîmîlasyonê dixwazin komên ku di bin destên xwe de digrin, ji qabîliyeta berxwedanê bixînin û ji bo vê yekê jî amurên destên wan de distînin. Di serî de li ser zimanê herêmî ku zihniyetê îfade dike zimanê serdest tê ferzkirin. Bi rêya zimanê fermî çanda zimanên herêmî têne baskokirin û nikarin di jiyanê de rol bilêyîzin. Çand û zimanê serdest weke zimanê xwendin, siyaset û aboriyê ji bo kesên bi kar bîne xwedî sud e. Kesê çand û zimanê bindest jî bi kar tîne wenda dike. Di nava vê dualiyê de zehmet dibe zimanê herêmî xwe li dijî zimanê îqtîdarê rabigre. Hela ger ev ziman nebibin ên nivîsariyê û zaravayê xwe yê sereke dest nîşan nekiribin. Wê dawiya van ziman û zaraveyan tarî be. Asîmîlasyon ne tenê li ser ziman her wiha li ser hemû saziyên civakî yên îqtîdarê şekil dane wan tê meşandin. Dîn û netewê serdest di her astê de li gor rastiya saziyê tê dawerivandin. Sazî hetanî di warê siyasî, civakî, aborî û heta zihnî de bi awayekî fermî were naskirin û bi awayekî hiquqî were parastin, saziyên hindikayiyên din û yên têkçûyî xwe li gor saziyên serdest an bi zorê yan jî bi dilê xwe, li asîmîlasyonê diqewimin û di nava fermiyetê de cihên xwe digrin. Zordarî aborî û berjewendiyên siyasî çiqas bikevin rojevê helandin jî ew çend zû dibe.

Li ser hebûna çanda Kurdistanê herî kêm bi qasî şer û terorê asîmîlasyona bi darê zorê roleke texrîbkar lêyîstiye. Em dikarin heman rêbaza dîrokî pêk bînin û biçin hetanî serdemên seretayî. Eger em bibêjin çand û zimanê Sumerî ziman û çanda herî mezin a asîmîlasyonê bû, divê weke gotineke nepixandî neyê dîtin. Em vê yekê ji nîzama hevok û peyvên wê fêm dikin. Berê zimanê Sumerî û li gor rêzê Hurî, Mîtanî, Urartu, Medî û Persî, piştre jî li gor rêzê zimanê Babilî û Asurî çavkaniyên wan Aramî ne. Paşê jî Aramî di serdemên seretayî de li Rojhilatanavîn zimanên asîmîlasyoneke mezin bûn. Mirov dikare vê rastiyê di pirtûkên Hîtît, Urartu, Mîtanî, Med û Persan de bibîne. Mîna İngîliziya îro zimanê Aramî jî weke "înteretnîsîte" ya wê demê zimanê hevpar ê ji hev du fêmkirinê bû. Nexasim arîstokrasî û bûrokrasiya dewletê yek ji zimanekî zêde bi kar tîne jî zimanê Aramî ye. Zimanê herêmî tevî zimanê Aramî tê bi karanîn. Mîna ku em îro jî dijîn, zimanê fermî yê îqtîdarê di danûstendinên fermî yên dewletê de esas tê dîtin û di wê demê de Aramî- hînê berê Akadî û Sumerî- zimanê esasî ye. Zimanên herêmî zêdetir di nava gel de ku kesên xwendin û nivîsandina wan nîne weke amurekî ragihandina devkî bi kar tînin. Mirovê vê rastiyê dikare di pirtûkên Urartuyan de bibîne. Çawa ku piraniya rêveberên dewletên bindest bi zimanên İngîlîzî û Fransî dipeyivin.

Di pirtukên Persan de cihê Aramî eşkere ye. Di wê demê de li hemû rojhilatanavîn him zimanê dîplomasiyê him jî zimanê bazirganiyê ye. Di hemû tomarên pêwendîdar de tê dîtin ku asîmîlasyon di mîmariya rêveberiya dewletê wêjeyê û hiquqê de roleke mezin lêyîstiye. Heta tê texmînkirin ku

Îsa jî bi Aramî zanîbûye. Zimanê Suryanî ku şêweyekî netewî yê Aramî ye. Amurekî din ê asîmîlasyonê ye. Zimanê Îbranî hînê di qadeke bi sînor de xwedî bandor e. Lê Helenîzm ji ber ku di rewşa dijber de belav dibe, zimanê Helenîzmê li rojhilatanavîn xwedî bandor e. Mîna İngîlizî û Frensiya îro. Helenî û Suryanî jî bi hev re di riyekê de ne. Her du jî li Kurdistanê nemaze li bajaran ji bo bitesîr bibin têdikoşin. Riha ji bo vê yekê mînakeke xweser e. Aramî çandeke kûr e ku Ermenî, Suryanî, Erebî, Kurdî û herî dawiyê jî Tirkî jiyaye. Lê belê di heman demê de rê li ber asîmîlasyoneke dijwar û kozmopolîtîzmeke zêde vedike. Mirov ji rewşa îro ya Rihayê vê rastiyê baş dikare fêm bike.

Rola zimanê Suryanî di çanda Kurdistanê de ji Erebiya paşê li pêştir e. Mirov dikare bibêje weke zimanê ronîbûnê rol lêyîstiye. Ya esas ji ber ku Suryanî li bajaran rûniştin, ev encam derdikeve holê. Kurd weke xelkê Komagene zimanê devkî yê koçerî û gundîtiyê zaraveyên Kurdî bi kar tînin. Çavkaniyên wan ên nivîskî bisînor in, lê nayê wê wateyê ku qet nînin. Nemaze li paytexta Mîtaniyan Waşukaniyê (li ser sînorê îro yê Suriyê-Tirkiyê bajarê Serekaniyê û Amudê) gelek tomarên nivîskî raber dikin ku BZ di salên 1500’an de proto-Kurdî weke zimanê nivîsê hatiye bikaranîn.

Li Kurdistanê BZ di salên 300-250’an de di heman qraliyetên Helen de hebûna xelkê bi koka xwe, Helen û nemaze giraniya wan a li bajaran nîşan dide. Ku zimanê Helenî demeke dirêj hatiye bikaranîn. Mîna rola zimanekî mêtîngeriyê rol dilêyîze fena di roja me ya îro de bajarên Kurdistanê bi çand û zimanên biyanî dijîn. Xelkên li derveyî bajaran jî bi çand û zimanên xwe yên herêmî dijîn.

Bi Îslamiyetê re zimanê derdikeve pêş zimanê Erebî ye. Erebî ku berê zimanê bedewiyan bû, bi bajarbûn û derketina Îslamiyetê re li Rojhilatanavîn bû zimanê herî xwedî prestîj. Zimanê zanist û wêje yê. Erebî weke zimanê fermî yê îqtîdar û şer serdestiyeke mezin bi dest xist. Li hemberî zimanê qels ên bi koka xwe Efrîqî li hemû bakurê Efrîqa û heta başurê Zagros-Torosan serdest bû. Çand û zanist jî bi Erebî tê kirin û tê jiyîn. Xwedî cihekî cihêwaz e. Yên zimanê Erebî bi kar tînin, dikarin di nava bûrokrasiyê de cih bigrin, dikarin di nava çîna ilimdaran de cih bigrin û ilim bikin. Ji lewre Erebî zimanê mezinbûn û berjewendiyan e. Girîngiya wê ya hetanî îro jî deyndarê van rastiyên madî ye. Piştî Erebî rola Farisî hîna bisînor e. Ew jî nexasim bi desthilatdariya Selçuqiyan li Îranê bû zimanê fermî û belav bû. Kengî Selçuqî Anatolyayê zevt dikin û dewleteke navenda wê Konya, avadikin jî zimanê fermî Farisî ye. Mewlana berhema xwe ya bi navê “Mesnewî” bi Farisî nivîsandiye. Zimanê Tirkî jî weke zimanê Kurdî wê demê xelkê li derveyî bajaran weke amurê axaftina devkî û wêjeyê bi kar tînin.

Serdestiya Erebî, li Kurdistanê bitesîr bû. Nemaze tebeqeya mele- seydayan zimanê Erebî weke zimanê îbadetê dibînin û ev yek dibe sedema bandoreke dijwar. Her wiha xelkê li bajaran dilê xwe dibijînin şêwaza jiyana Ereban. Em ji kinc lixwekirinê şikil û şibût bigrin hetanî dara nifşan a xwe digihîne Ereban, dibe mode. Di çîroka her xanedayiyê de qulbeke Erebî pir normal dibe. Serdestiya di warê perwerde, hîndekarî, mode, siyaset, dîplomasî, huner û zanistê de li ser zimanekî mîna Farisî ku di warê dewletê de xwedî ezmûn bû jî, bandor kir. Nîv bi nîv dagirkeriya

Ereban diqewime, hemû Rojhilatanavîn nav û leqebên Erebî li xwe dikin. Ev serdestî hetanî pêşketina têgihiştina netew-dewletan û netewan bi awayekî dijwar didome.

Bi belavbûna sîstema kapîtalîst û şikilgirtina netew-dewlet ve pêvajoya asîmîlasyona li ser çand û zimanê Kurdî hîna dijwartir dibe. Li zordestiya Erebî û Farisî ya Tirkî jî zêde dibe. Di serdema seretayî û navîn de çand û zimanê Kurdî yê di nava etnîsîteyê de hebûna xwe parast. Bi derfetên teknîk û zanistê yên zêdebûn sê çand û zimanên serdest weke çand û zimanên fermî bi bandora xwe zimanê Kurdî baş pelixandin û helandin. Çand û zimanê ku di serdema navîn de jî gelek berhemên wêjeyî (mîna Ehmedê Xanî, Mem û Zîn) dan, di bin zexta siyasî de her ku çû teng bû. Kurdîtî weke çand û ziman xistin rewşeke biguman. Kirin mijara guneh û gunehkariyê, her ku çû Kurdbûyîn krîmînalîze kirin. Bi pratîka herî dijwar a guneh-zindan a bûrjuvazî re rûbirû hate hiştin. Pirsgirêkên têkîliya xwe bi rastiya Kurd re hebûn, di kategoriya gunehên xeter de hatin hesibandin. Her sê netew-dewlet jî –Tirk, Fars û netewa Ereb- ji çand û zimanê dewletê wêdetir li ser hemû hebûna wê helandin dûrkirin û kampanyayeke bi çand û zimanê serdest ve girêdan û bi dijwarî dan meşandin. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî Kurdî jî tê de hemû dibistanên perwerdeheyê lê hatin qedexekirin. Lê derfet û îmkanên wî yê hebûna dikaribûn li dibistanên netewê serdest modernîzm hînbibûya Kurd û Kurdî di her warî de li derveyî modernîzmê hate hiştin. Çapkirina pirtukan rojname û mûzîkeke herî normal a Kurdî weke Kurdewarî hate hesibandin û di çerçoveya guneh de hate qebûlkirin. Lê wan

bi xwe di zimanê xwe de netewparêziyeke Hîtler li dawiyê bihêlin dikirin. Ji teoriyên wan ên netewê herî mezin gav nedihatin avêtin. Miletê necîb navê Ereban bû. Tirkîtî rastiyeke bexteweriyê bû. Farisî esilzadeyiya herî mezin a dîrokê bû. Hisên netewparêziyê yên kapîtalîzmê şiyar kirin. Bûn xwedî bandoreke narkotîkane, ku hemû rewşên paşverû binuxûmîne.

Lê sêyemîn pêngava mezin a globalbûna kapîtalîzmê mezinbûna lokaltiyê weke nirxekî pêşveçûna teknolojiyê ye. –radyo, tv- qedexeyên li ser ziman bêwate kirin. Xebatên li derveyî welat kirin ku hindekî Kurd û Kurditî bi ser xwe ve werin. Bêguman di bingehê vê rastiyê de bandoreke diyarker a têkoşîna hemdem hebû. Berxwedana demokratîk a netewî bi xwe re nasnameya Kurd, ziman, çand û ji xwe piştrastî anî. Li dijî zora şer –îqtîdarê ya asîmîlasyonê- bi darê zorê afirand. Ji berxwedana xwe parastinê ji nû ve derketina çand û zimanên netewî re pîriktî dikir.

# Hebûna Çandî Bi Ziman Pêkan E

Yê ku qeyd û kelepçe li zimanê wî hatibe xistin, li mejiyê wî, dilê wî nerîna wî jî qeyîd û kelepçe hatiye xistin. Hîn ez di heft –heşt saliya xwe de dema diçûm dibistana seretayî ya Cibînê, gundê cîranê me, min yek peyv jî bi Tirkî nedizanî. Di çûn û hatina dibistanê de min her dem ji xwe dipirsî; çima em bi Kurdî fêr nabin û çima dibistanên bi Kurdî nînin? Bêmafiya bi ser me de tê rêvebirin, di wan salan de min ferq kiribû. Perwerdeya bi zimanê dayîkê, mafê herî girîng û bingehîn e; di nava mafên sê nifşan de cih digire. Di hevpeymanên Ewrûpa de heye. Di hevpeymana mafên kesî û şaristanî û hevpeymana mafên aborî, civakî, çandî ya Netewên Yekbûyî de jî ev maf heye.

Hebûna çandî bi ziman gengaz e. Di vê mijarê de ziman, faktorekî herî giring e. Ger zimanê dayîkê tê qedexekirin, ev nijadkujiya (jenosîd) çandi ye… Ji nijadkujiya fîzîkî tirsnaktir e. Ma bila Kurd tune bibin? Ger ev wiha bidome, wê Kurd bihelin û biçin. Ma emê nikaribin zimanê dayîka xwe bixwazin? Divê mijarê de, divê dayîk û zarokên Kurdan xwestekên xwe bi dengekî bilind bînin ziman, reaksiyonên xwe yên demokratîk raber bikin; ev yek mafê wan ê herî xwezayî ye."

Tu neteweyeke bêziman nikare were hizirandin, lewma divê xebatên di berbarê zimanê Kurdî de çalaktir bin. Ma çima hetanî niha saziyeke zimanê Kurdî nîne. Ataturk jî dema nû komar damezirand, destpêkê Saziya Zimanê Tirkî saz kir. Divê em jî bi lez bigihên saziyeke bi vî awayî. Ger

hetanî niha saziyeke bi vî awayî nehatiye avakirin, ev yek kêmaniyek e û leztirîn ev kêmanî ji holê were rakirin.

Her wiha ev yek weke Akamiya Ziman jî dibe. Ya girîng ew e ku demeke zutirîn di warê zimanê Kurdî xwe gihandina sazîbûnê ye. divê ev xal werin nîqaşkirin û bigihên sazîbûna Zimanê Kurdî.

***Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hînî zimanê xwe yê dayikê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne?***

# Tevkujiya Çandî ji ya Fîzîkî Xirabtir e.

Mişextiya sê mîlyon Kurdan, ma ne nîjadkujiye, lê çi ye? Bi dehan mîratên dîrokî yên ku di bin bendavan de mane, çanda me ne, lê di bin avê de tên hiştin. Ev meseleya bendavan jî pêkanîneke bi zanebûn a tevkujiya çandê ye. Tevkujiya çandî ji ya fîzîkî xirabtir e. Mînak, Cuhî bi ber tevkujiya fîzîkî ketin, lê ji ber ku aliyên xwe yên entelektuelî bihêz girtin, ji ber ku di vî alî de gelekî xebitîn, karîbûn çanda xwe biparêzin. Dîsa di herêmê de hebûneke zêde ya leşkerî mijara gotinê ye, ev yek jî şêwazeke dagirkeriya leşkerî ye. Îro statuya Kurdên li Tirkiyê ev e. Ev statuya ku ji Kurdan re rewa tê dîtin, ne di nava feraseta olî de xwedî cih e, ne jî di rastiya biratiyê de hiltê.

Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hînî zimanê xwe yê dayikê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne? Ez hindekî jî ji ber vê rastiyê li dij malbatê û têkîliyên heyî yên jinzilam im. Ez nefretê ji vê şêwaza têkîliyê dikim.

Ji aliyê min ve feraseta sosyalîzma reel û dewleta netew hatiye têperîn. Ez li şûna vê pêşniyara netewa demokratîk dikim. Di ferasetê de her kes dikare bi nasnameya xwe ve azad bijî. Jinûve zayîn û parastina van çandan zirarê nayne. Ji ber ku çand û nasname nikarin werin tunekirin. Rojava vê yekê fêm kiriye. Bi vê boneyê li Rojava girîngiya ji

kêmnîjadan re tê dayîn, esas ji ber têgihiştina şaşiya bi îdeolojiya dewleta netew ve tunekirin û çewisandina çand û nasnameyan e. ji ber vê yekê ev çand ji nû ve zindî dibin. Mesela îro tê xwestin ku li Îngîlistanê çanda Keltan ji nû ve zindî bikin. Ev tiştekî baş e. Divê li Tirkiyê jî Laz Laziya xwe, Kurd Kurdiya xwe, Gurcî Gurcîtiya xwe, Tirk Tirkiya xwe ûhw. her kes bikaribe bi azadî çanda xwe bijî. Ev çand dewlemendî ne. Lê divê hemû xwedî girêdayîneke hevpar bin. Ne şerte ku mirov ji vê re bibêje nasnameya jor, mirov dikare bibêje nasnameya giştî jî. Ev yek jî dikare bi feraseta neteweke demokratîk, bi makezagoneke demokratîk û pergaleke hiquqî ya pirçandî ve pêkan be. Ya em jî dixwazim ev e. Divê ev yek pir baş were fêmkirin.

***Divê em xebatên zimanê Kurdî bigihînin sazîbûnê, divê em dibistanên Kurdî vebikin,***

# Zimanê Kurdî Tevkujiyekê Dijî

Bêguman pirsgirêka ziman, pirsgirêkeke giran a nîqaşê ye. Kesên ku dibêjin, “divê wêje bi tevahî bi zimanê Kurdî be” hene; yek jî kesên ku dibêjin, “girîng nîne, bi her zimanî dibe” hene. Ya min hindekî riya navîn esas digre. Li gor min dê wêjeya Kurdî demeke dirêj bi zimanê serdestan ve were meşandin. Bi qandî ku rizgarî pêk were, dê hêdî hêdî zimanê Kurdî bikeve dewrê û çalak pêk were. Em çi qas vê yekê nexwazin jî, êdî ev yek rasteqîneke pêkhatina avedaniya mêtîngeriya heyî ye. Ev rasteqîneke objektîf e. Ger em bixwazin jî, em nikarin bi tu awayên din tevbigerin. Hînî nivîsandina bi zimanê Tirkî, Erebî û Farisî bûne. Weke din tu mijarên wan nînin. Lê ne pêkane ku mirov hema li ser wan “nivîsandina Kurdî” bisepîne. Ji ber ku di asta karîna nivîsandinê de nînin. Lewra, zimanê Kurdî jî hîna negihiştiye zimanê wejêyeke bihêz.

Ez eşkere bibêjim: nivîskarekî herî jîr ê di zimanê Kurdî de şareza, çi qas li xwe bide zorê jî, çi qas bikaribe binivisîne jî, nikare zêde xwendewanan peyda bike. Ji ber ku zimanê Kurdî bi xwe tevkujiyekê dijî. Zimanê Kurdî bi xwe negihandine zimanê wêjeyeke bihêz, zemîneke wî ya netewî nehatiye pêşxistin, nehatiye pejirandin. Ji sedî pêncî zêdetir bi zimanê netewa serdest diaxivin. Ev rasteqîniyek e. Kurdî bi xwe hîna negihiştiye rewşa zimanekî netewî, ev jî rasteqînek e. Ger em bi lehceya kurmancî binivisînin, ên soran û zaza tênagihên, ger em bi soranî binivisînin, ên kurmanc tê nagihên. Lewra divê mirov li ser zimanê netewî biponije. Avakirina zimanê netewî jî xebateke pêvajoyê ye.

Mînak, zimanê Tirkî jî di nava tevahiya dîroka komarê de encax nû digihê asta zimanekî wêjeyî. Zimanê Tirkekî Anatoliyî, yekî Tirkmen û Ozbek qet tênagihên. Belkî Zazayek dikare di Soranî de nêzbûnekê peyda bike, lê di wan de ev yek jî nîne. Bi wê wateyêye ku di nava netewên din de jî heman pirsgirêk mijara gotinê ye. Di Farsan de, di Ereban de ev pirsgirêk heye. Bi qandî ku Erebekî ji Suriyê nikaribe ji Erebekî Fasî fêm bike, pir cewaz diaxive. Divê mirov vê yekê pir sosret pêşwazî neke. Di me de mêtîngeriyê ev yek xirabtir kiriye. Ez ji xebatên zimanê netewî re dibêjim erê, divê di zanîngehan de ev beş werin vekirin.

Bêguman divê di televîzyonan de bi giranî li ser vê mijarê were rawestîn. Dîsa divê mirov hêdî hêdî di dibistanên seretayî de derbasî perwerdeya bi zimanê Kurdî bibe. Lê wexta ku ev yek pêk neyê jî divê em xwe perîşan raber nekin. Dîroka me wisa bû. Îro Hindistan jî, pir zêde nikare bi zimanê Hindî biaxive, zêdetirî wan bi İngîlizî xeber didin. Cezayirî herî zêde karê xwe bi zimanê Fransî pêk tînin. Belkî em jî demeke dirêj bi zimanê Tirkî xebatên xwe bimeşînin. Lê ji bo zimanê Kurdî bibe zimanekî netewî û ji bo ku em bikaribin ji zarokan hetanî mezinan di nava herkesî de bidin rûniştin, bikin zimanê rojane, emê bi sebr û rik xebatên xwe bidomînin. Lewra divê mirov di vê çerçoveyê de nêzî pirsgirêka ziman a demê bibe.

Ger pêkan be, divê mirov hêdî hêdî bi zimanê Kurdî berheman biafrîne. Ya mijara gotinê, ne tenê karên nivîskariyê ye. Mesela mirov dikare bi zimanekî Kurdî yê pak û zelal filmên sînema û rêze filman bikişîne, amade bike, dîsa belgewar dikarin werin amadekirin. Lê ji bo

zimanê netewî û wêjeya netewî hîna gelek kar li pêşiya me hene. Ji ber ku ev yek wisa pêk nayê jî, divê em bi xwe, xwe vê pirsgirêkê pir mezin nekin û nekevin nava nîqaşên pir çors û sexte. Divê nîqaş di vê çerçoveyê de bin.

Divê xebatên zimanê netewî çawa çêbibin? Ger di vê mijarê de Kurdên şareza hebin, bila hetanî dawiyê pê re mijul bibin. Divê em bigihînin sazîbûnê, divê em dibistanên Kurdî vebikin, pêwîste nîqaş bi van aliyan de bin. Lê divê em nekevin nîqaşên seranser ên weke ka emê bi Tirkî binivisînin an jî bi Kurdî. Li hember hev pêşxistina hindek tawanbariyan jî ez xeter dibînim û ev nêzîkatî ne di cih de ne. Niha ez bi zimanê Tirkî bi navê Kurdan çalakiya herî mezin didim meşandin. Vê çalakiyê zimanê Kurdî jî bihêztir kir, giyana Kurdî jî gelekî mezintir kir. Ji bo gelekî bikaranîna zimanekî din, bi qandî qonaxeke girîng ber bi şoreşê ve jî biriye. Ez dikarim gelek mînakan jî bidim.

Lewra pêşnexistina nîqaşên rûser pir girîng e. Em dikarin tirkî jî weke çekekê li dij şêwaza tunekirînêr a dijmin bi kar bînin. Perwerdeyên ku îro em bi Tirkî dikin, pir erjeng milîtanên me didin şerkirin. Lê ev yek têr nake, bedewî û xwezatiya Kurdiya me jî heye. Ez bawerim ku, dê di dema pêş de bibe ziman û wêjeyeke xurt a Rojhilatanavîn. Wêjeya bi zimanê Kurdî, dîsa xwendina helbest û stranan a bi zimanê Kurdî gelekî rewneq e, peroş e û xweş e. Esas hewceyî bi demê û hewlên mezin heye.

***Ji beriya her tiştî ger em bikaribin di siyaseta xwe de serxwebûnê bi dest bixin, dê çand jî bi yekê re bi pêş bikeve û serdest be. Divê mirov ji bo vê yekê dijminahiya zimanan neke. Ger mirov dijminahiya zimanan bike, nikare tu tiştî jî bi dest bixe.***

# Divê ji bo Zimanê Kurdî Cihên Azad Werin Afrandin

Ya ez dixwazim bikim him ji bo zimanê Kurdî, him jî ji bo lehceyên din afrandina qadên azad e. Ger ez niha zimanê Kurdî weke zimanê fermî îlan bikim, dê ziman bi xwe zerarê bibîne. Sedema yekem pir kes jê fêm nakin. Ya duyem ziman hîna xwe ava nekiriye. Gelek lehce têkilhev bûne. Ev yek dê bibe sedema parçebûn û cahiliyê. Ger mirov a rast bibêje, her kes dikare di zemîna me afirandî de biaxive, heta dikare zimanê eşîreta xwe jî biaxive. Divê mirov ne li dijî vê yekê be.

Ji bo zimanê bijartî jî divê hêdî hêdî komîteyek li ser kar bike û bixebite. Niha dema vê ya rast e û derfetên vê yekê jî hatine afirandin. Divê ji bo Kurdiya bilind komîteyek were damezrandin. Kî ji ziman fêm dike, dikare çawaniya pêşvehatina ziman a hetanî roja îro lêkolîn bike, wan zanînan berhev bike û bi rêya xebateke demdirêj a vê komîteyê ve dikare zimanekî bilind a kurdî ava bike. Yanî mirov dikare Soranî, Dimilkî, Kurmancî û Goranî ava bike. Piştre jî gel dikare vê yekê weke zimanê xwe bi kar bîne. Divê sîstema ziman wisa were meşandin. Hetanî ev yek pêk were jî divê her lehçe di qada xwe de xebatê bimeşîne, bi wî zimanî klaman bistrê, axaftinan bike û çawa dixwaze dikare wisa bi kar bîne. Azadiyeke bêsînor... Em li vê derê nikarin zagonên vê yekê ava bikin. Ev tiştekî xwezayî ye. Ji bo tiştên xwezayî him dem û him jî cih hewce ye.

Mînak berê jî digotin ku “ger tu dixwazî ji bo Kurdewariyê hindek tiştan bikî, divê tu destpêkê rê bidî zimanê Kurdî”. Min tu caran li pêşiya xwe nekirin asteng. Hindek ev sed salin dixwazin ji bo ziman hindek tiştan bikin, lê nikarine ji bo Kurdeyetiyê hindek tiştan bikin. Min bi Kurdiyeke bihêz dest bi şoreşê nekir. Min bi zimanê Tirkî dest bi şoreşê kir, niha jî xizmeta herî mezin ez didim. Kurditiyê wisa ez bi kûrahî û dirêjahiyê ve dimeşînim. Ji gelek lehceyên cewaz pir pirtûk jî çap dibin. Min bi xwe ev nekirin, lê min rê li ber van vekir. Min derfetên siyasal û îdeolojîk afirandin. Tuyê çend salên din bi şûn ve jî bibînî ku di Kurditî jî cihê xwe yê herî mezin bigre. Ya tê meşandin û ya rast jî ev e. Yên din pir baş nakin, pirsgirêkê gelekî teng bi dest digrin, ger wisa bidomînin dê bidin wendakirin.

Di nava me de tu caran pirsgirêka zimanan dê dernekeve. Dibe ku di demên pêş de li dibistanên me zimanên tirkî û yên erebî jî werin bi karanîn, divê mirov misoger ji vê yekê netirse. Lê divê mirov hêdî hêdî dibistanên Kurdî bide avakirinê. Ev hetanî demekê jî dê bi hev re werin bi rêvebirin. Ger Kurdî qels be, dê zimanên gelên cîran hetanî demekê serdest be, piştre dê hêdî hêdî bigihên heman astê û di nava hevsengekê de werin meşandin. Bi demekê şûn ve jî êdî dê zimanê Kurdî yê bilind serdest be. Ji beriya her tiştî ger em bikaribin di siyaseta xwe de serxwebûnê bi dest bixin, dê çand jî bi yekê re bi pêş bikeve û serdest be. Divê mirov ji bo vê yekê dijminahiya zimanan neke. Ger mirov dijminahiya zimanan bike, nikare tu tiştî jî bi dest bixe.

Lê divê mirov bi hêz û kûr jî li ser zimanê xwe raweste. Bi qandî ku mirov ne xwedî nêzîkatiyeke weke “min bi

zimanê dijmin dest pê kir hetanî dawiyê jî ezê wisa bidomînim" be, her wiha divê mirov di vê mijarê de nêzîkatiyeke pir teng jî raber neke. Nêzîkatiyeke weke "ez ji zimanê xwe pê ve hînî tu zimanan nabim" jî nêzîkatiyeke pir di cihê xwe de nîne. Esas her du nêzîkatî jî yek in. Her du jî zirarê didin. Divê mirov di vê derê de hevsengê bi dest bixe. Ez dibêjim ku lehce jî pê re, her kî çi dixwaze bila wisa bike, lê zimanekî xwedî hêz jî hewce ye. Divê mirov çend zarokan ji dibistana seretayî hetanî bi zanîngehê rêxistin bike. Eger bi vê şêwazê bi rê ve biçe ez bawer nakim ku dê tu pirsgirêk derbikevin holê. Derfet tên afirandin, her ku diçe qadên xebatê jî zêde dibin. Mirov dikare mamosteyan li hev bicivîne û li ser hindek plan û bernameyan bixebite. Mirov dikare xebatên ziman bi şêweyeke wergirî bi vê azîneyê bi rê ve bibe.

Di cîhanê de hatiye peyitandin ku nêzîkatiya nîjadî nêzîkatiyeke herî paşverû ye. Nîjadperestî temsîliya paşverûtiyê dike. Tu nirxekî çand û zimanê nîjadeke paşverû nabe, tune ye, ev yek şaş e û dê hêdî hêdî ji holê rabe. Ev nêzîkatî li dij mirovahiyê ye. Rast e, dijmin te ji zimanê te qut dike, jiyana xwe û zimanê xwe li ser te serdest dike, wê bi te dide hezkirin û dihêle ku ji zimanê xwe nefret bikî. Di vê derê de texrîbateke mezin heye. Lê tiştekî dîtirê jî heye. Ez bêhtir hînî tirkiyê dibim, heta ji Serokomarê dewletê zêdetir ez hez ji taybetmendiyên tirkiyê dikim. Lê ev li pêşiya hezkariya min a kurditiyê ne asteng in. Berovajiyê vê Kurdîtiya herî mezin jî min kir û dikim. Vaye ev meseleya enternasyonalîzm, hûmanîzm û biratiyê ye. Ger van bi hev re nemeşînî tuyê bikevî nava xeletiyeke pir mezin.

Nîjadperestiyeke teng sedema mirina gelên weke Ermenî û Sûryaniyan e.

Ji aliyê din xwe nedana helandin jî xaleke gelekî girîng e. Min xwe neda helandin. Ma hun dizanin şertê min ê yekem çi bû? Min ji zaroktiya xwe û vir ve helandin da rawestandin. Ez bûm fermanberekî (memur) mezin jî, min zanîngeh jî qedand, lê ji bo ku ez xwe nedim helandinê min tenezilê jiyana serdest jî nekir. Ez naxwazim we rexne bikim, hînbûna ziman jî gelekî girîng e. Lê niha hun serê min jî jêbikin, ez nikarim hînî zimanê kesekî bibim. Gelek ziman hene; hun tevahiya Ewrûpa jî bidin min, ez hînî zimanê wan û jiyana wan nabim. Ez nîjadperestekî teng nînim, gelekî mirovhez im, lê bi zimanên din nikarim biaxivim, hez nakim. Çi xizmetî biratiyê û yekitiyê bike ez ji wê hez dikim. Di vê mijarê de min xwe terbiye kiriye.

Bingehê biratiyê mezinkirina Kurdiniyê ye. Ev yek ji bo gelê Kurd a herî baş e. Mînak hindek rêberên Kurdan cilên Kurdî li ber xwe dikin, lê koleyên herî mezin ê dijmin in. Her dem bi Kurdî diaxivin, lê xizmeta ku ew ji nîjada Tirkan û faşîzma Tirk re dikin, Tirk bi xwe jî ji xwe re nakin. Vaye di vê derê de mesele tenê li ber kirina cilên Kurdî û axaftina peyvên Kurdî nîne. Pirsgirêk rêzdariya ji biratiyê û mezinahiyê re ye. Rêzdariya ku me hetanî niha ji biratiyê re raber kiriye hetanî niha tu rêberan raber nekiriye û em dixwazin vê yekê bi vî awayî jî bidomînin. Li hember Tirkan misoger ez xwe biçûk nabînim. Li hember paşe û serokên wan xwedî rêzdariyeke mezin im. Ez şivanek im, gundiyekî ji rêzê me. Lê zanîna netewî ya ku min bi dirustî wergirtiye

difermîne ku, Kurd jî miletek in, Kurd jî miletekî xwedî şeref in û misoger divê werin pejirandin.

Hindek serokeşîran şêwazek afirandin. Cil û bergên Kurdî li ber xwe kirin, bi zimanê Kurdî axivîn, lê mala Kurdan wêran kirin. Ev waneyeke (ders) mezin e. Divê rewşenbîrên me bi giranî li ser van mijaran rawestin. Bila tiştekî xelet nekin. Dibistanên Kurdî çêdibin, mirov dikare hetanî bi zanîngehan jî ava bike, lê ji bo vê yekê hewceyî bi demê heye, bi amadekariyan heye. Ev meseleyeke zanistî ye, lêkolîneke zanistî hewce ye, derfet hewce ne. Bi qedexe yan jî bi cilan ve nabe, tenê bi çend peyvên sivik ên Kurdî nabe. Ev yek hatiye peyitandin. Hindek ji bo min dibêjin "çima bi Kurdî naxive?" Naxêr! Ez dikarim xebatên bi Kurdî bidim meşandin. Min di serî de jî anî ser ziman, min ji bo klameke Kurdî dest bi şoreşê nekir. Ev nêzîkatiyên xelet in. Bila tu kes xwe nexapîne, bila tu kes li ser me bi erzanî neaxive. Nirxa xebatên ku min li ser çand û zimanê Kurdî kirine gelekî mezin in. Ez van ji hev cuda dikim. Mirov çawa dikare bi çanda gel û dilê gel re be, dîsa mirov çawa dikare bi dijminên gel re be? Van her du xalan ez baş ji hev nasdikim û pêk tînim.

# Tenê Nivîskariya bi Zimanê Kurdî Têr Nake

Ez dixwazim li vir bala we bikşînim ser xaleke girîng. Ev yek bi qandî ku girîng e her wiha xwedî nirxeke mezin e jî. Rabûna kesekî ya bi xebata nivîsandina romanekê wêjeyî û berhemeke din a bi zimanê Kurdî, tenê xebateke bidestgirtina karekî wêjeyî nîne. Ji ber ku kesayeta Kurd di nava zîhniyeta serdestiyê de heliyaye. Lewra zu bi zu nakeve ser çanda Kurdî. Divê mirov misoger li hember vê bûyerê şiyar û agahdar be. Ev yek dê rê li pêşiya bêgiyaniya wêjeyê vebike. Ji lewra wê demê her xebata nivîskî ya wêjeya Kurdî ji şikil wêdetir tu tiştekî îfade nake û di hundirê xwe de jî tu wateyekê naderbirîne.

Li hember vê rastiyê tenê nivîskariya bi zimanê Kurdî têr nake, gelek aliyên ku hewceyê dest girtinê peydane, ji deruniya civakê bigre hetanî bi rastiya rojana ya civakê hemû di hundirê vê rastiyê de peyda ne.

***Ger naveroka nû dil e, şêweyê kevin zimanê vebêjê ye. Ger mirov herduyan neke yek, yekgirtin nabe. Ger em bikaribin vebêjê bi naveroka nû re bikin yek, ez bawerim dê ev bibe ronesanseke wêjeyê jî.***

# Roja Ronasansa Kurd Hatiye

Li gor min Vêbeja (mit) Kurdî, çîrokên Kurdî, serpêhatiyên Kurdî mijarên herî girîng ên wêjeyê ne û zindîbûna xwe jî hîna diparêzin. Ez qanehim ku, ji serdemên herî kevin ên dîrokê ve xwedî naverokeke wêjeyî ya bihêz in. Di roja me de jî, rexmî mêtîngeriya tirsnak, xweparastina wan û xwe domandina wan gelekî girîng e. Bi taybet klambêj, dengbêj û çîrokbêj dikevin mijara wêjeyê. Pirsgirêka wan a **nûjenkirinê** heye. Yek jî pirsgirêka wan teşekirina bi teknîkê heye. Mesela niha televîzyon gelekî girîng e. Divê em cih bidin, çîrokbêjan, helbestvanan, dengbêjan û klambêjan. Di Kurdan de ev yek pir bihêz e. Divê em ji bo van saziyên lêkolînê damezrînin. Ev di wergiriya xebatên wêjeyê yên rastîn de ne. Divê em misoger nirx bidin van şêweyên klasîk.

Esas divê mirov bi nepixîna şoreşgeriya Kurd û serûbinbûna wê re girêdana vê yekê çêbike. Misoger evîna bi şêwazên kevin nabe, bi şêwazên kevin strîna klaman û vebêjiya çîrokan jî nabe. Divê edî ev îfadeyên xwe yên rojanî, bi îfadeyên klasîk ve bikin yek. Hemû netewan ev yek pêk aniye, divê edî em jî wêrekiya pêkanîna vê raber bikin. Divê em naveroka wê jî nû bikin. Naveroka wê veguherîneke hewlnak dijî. Divê em şêweyê kevin ê berê jî bi vê naverokê ve bikin yek. Ev peywireke pir girîng e û li pêşiya wêjevanan ji bo serxistinê rawestiyaye. Qet hewce nake xwe ji ber bidin alî.

Divê misoger em şewêyên klasîk berdin, lê divê em naveroka nû jî tu caran li paş çavan nehêlin. Ger naveroka nû dil e, şêweyê kevin zimanê vebêjê ye. Ger mirov herduyan neke yek, **yekgirtin** nabe. Ger em bikaribin vebêjê bi naveroka nû re bikin yek, ez bawerim dê ev bibe **ronesanseke wêjeyê** jî. Hemû van tiştên me vegotin, esas tên wateya Ronesanseke Kurd a dereng ketî. Tevahiya Ewrûpayiyan vê yekê jiyîn. Mînak Kemalîstî jî dibêjin, “li Tirkiyê Ronesansa Anatoliyê.” Dereng be jî, em ji salên 1970’an şûn ve ev ronesans û vejîna Kurd dest pê kir. Li gor min bi şêweyeke semyan jî didome. Ji bo vê Ronesansê jî barên giran dikevin ser milên rewşenbîran. Çawa ku ev yek di rewşênbîrên Ewrupayî de gihiştiye îfadeyeke semyan, êdî di Kurdan de jî ev roj hatiye. Divê em vê yekê him weke şenseke mezin bibînin û him jî weke peywireke ku divê misoger were biserxistin li ser rawestin.

Banga min ew e ku, rewşênbîrên me tiştên vê gavê diqewimin bikaribin bi feraseteke rast binirxînin. Ezê di bin xizmeta wan de bim. Kesê ku herî zêde ji me re dide xeberan jî di nav de, ezê li hember hemûyan zimanekî medenî esas bigrim. Bila werim televîzyonê bi kar bînin, bila rojnameyan bi kar bînin. Herêmên ku ji aliyê gerîla ve rizgar kirine hene, bila werin wan deran. Bila werin gel me xweşikiyan bibînin, bila werin semyaniya gerîla bibînin. Herêmên rizgarkirî gelekî semyan û rewneq in, bila hêdî hêdî vê yekê bipejrînin. Bila herî kêm bi qandî rewşenbîrên ji neteweyên din bi kar bînin.

***Divê bînim ser ziman ku ka şoreşê çi li ser wêjeyê zêde kiriye. Şoreşeke bêwêje dişibe mirovekî tazî, bi kîretî dimeşe. Wêje bedewiya şoreşê ye. Şoreşeke bêwêje dişibe mirovekî kirêt.***

# Wêje Giyana Civakê ye

Ez xebateke bêziman a wêjeyê didim meşandin. Ez gelek caran di dersên xwe de li ser bingehê wêjeyê dersan vedibêjim. Ji bo wêjeyê ji ber ziman hewceyî bi hindek tiştên din hene. Ango ji bo bidestxistina zimanê wêjeya Kurdî, divê mirov civaka Kurdî ji hev cihewaz bike. Ev yek jî ji beriya ziman têgihiştineke psîkolojiyê û pêzanîneke civakî dixwaze. Lê ev bi qandî mirov bibêje nînin, kêm in. Ger tu ciwaka Kurdan nikaribî ji hev cihê bikî, û nikaribî psîkolojiya Kurd nas bikî, tu dê nikaribî wêjeya Kurdî bikî. Ev yek gelekî girîng e û ji nêz ve bi rastiya şoreşê re têkildar e.

Ger mirov nikaribe cihewaziya di navbeyna kesayeta dijmin afirandî de û ya şoreşê de, yanî cihewaziya di navbeyna jiyana dijmin û ya azadiyê de bibîne, hetanî êşa wî ji kûr ve nekişîne nikare wêjeyê bike. Ev xal gelekî girîng in û bingeh in. Ziman di qonaxa duyem de tê, ger bibe dê pir baş be, lê ger nebû jî mirov negrî. Ger ez li ser civaka Kurdan romanekê yan jî pirtukê binivisînim, ev yek pir xirab nabe. Belkî di demên pêş de ziman baştir bibe, ger wergera wî jî baş be, dê xwedî nirxekî mezin be. Em bi zimanê Kurdî bikin dê pir baş bibe. Lê min temaşe kir zemîna zimanê Kurdî nîne, wê demê jî mirov binivisîne dê kêmaniyeke mezin be. Divê em psîkolojiya civaka Kurd bi Kurdî binivisînin. Ev yek dê gelekî baş bibe.

Mirov kesayetekî Kurd an jî kesayetekî di nava dijmin de heliyaye bi Kurdî jî binivisîne, ev yek nabe romana Kurdan. Ev dê bibe romaneke Kurdan a çawa? Belkî xiyanetê bide nasîn an jî rave bike. Piştî ku te got, “zilamê Kurd e, baş e, heliyaye û bûye tirkan e” ma êdî tu wê bi Kurdî binivisînî dê çend pereyan bike. Ger tu bibêjî heliyaye, radest bûye, qediyaye jî, ew ne jiyana Kurd e. Divê mirov nekeve vê xeletiyê. Tiştên me nivîsandine jî, bi ziman û teşe ve Kurd e, lê bi naverok û puxte qet bêhna Kurdî jê nayê û tu eleqeya xwe jî pê nîne. Divê mirov nekeve kêmaniyê.

Ji beriya her tiştî divê mirov destpêkê bipirse ka Romana Kurdî çi ye? Di zemîna Kurdan de roman heye, yan nîne? Ma rewşa Kurdan dibe roman an nabe? Roman çi ye? Ez naxwazim bikevim nava danasîna vê, belkî hun ji min baştir dizanin. Di xebata romanê de gelek mînak hene. Mesele mirov dikare destana **Mem û Zînê** weke roman bihesibîne, em dikarin vê yekê ronî bikin. Li gor guncawiya demê divê mirov li ser romana Kurd raweste. Mînak divê Mem û Zînê bixe roman. Ger mirov wergerînê jî, dîsa weke berê nikare bi gel bide fêmkirin. Di vê xalê de min tiştek got: ez nabêjim bi peyvên Kurdî nenivisînin, ên ku wisa dikin jixwe hene.

Roman rasteqîniyek e, demogojî nîne. Eger di civakê de tiştekî nû neyê afirandin, dê rewşeke di navbera belavbûn û nûbûnê de derbikeve holê. Ger nûbûn pêk were dê belavbûn û kombûn derbikeve holê. Di hundirê civakê de kesekî ku pir zirarê dibîne heye û kesekî ku bidest dixe heye. Divê mirov pir bi kûrahî li ser van her du kesayetan raweste. Ger tu tenê li ser yekî rawestî ew nabe romaneke rasteqîn, ew dibe

pesindarî. Ez pesindariyê jî naxim asta romanê, pesindariyan nenivisînin.

Ger mirov li dijî rasteqîniyê binivisîne ev yek dê bibe redkarî. Ne pesindariyê û ne jî redkariyê binivisîne; ne her tiştî qebûl bike û ne jî her tiştî red bike. Ev hemû xelet in. weke tê gotin, "şoreş hindek mirovan tengav dike" divê mirov pir bi kûrahiyê li ser van mijaran raweste. Gelekî kêfa min jî ji van lêhûrbûnan re tê. Bi derketina şoreşê re kê tengav bû, çawa tengav bû? Ger hindekî zehmet be jî hindek tişt pêk tên. Divê mirov vê yekê pir dorfireh li ser raweste. Yên ku di navberê de mane, ne dest ji vê berdidin û ne jî dest ji yên din berdidin. Esas sê hêman in, sê jiyan. Divê mirov di nava romanekê de li ser van her sê jiyanan jî raweste.

Xaleke din jî, xwedî destpêk e, xwedî navgîn e û xwedî dawî ye. Em dikarin çerçoveya romanê wisa danin. Bêguman zimanê romanê jî gelekî girîng e. Bi Tirkî, Kurdî, Erebî, Rusî ferx nake. Mirov kîjan zimanî guncaw dibîne divê bi wê binivisîne, qet yek jî xirab nîne. Lê roman, tenê nivîsandina tiştên rast e. Ger mirov pir ji rastiyê dûr bikeve, wê demê dê pir xeyalî be û zêde tu wateyê naderbirîne. Dîsa yan dê bibe pesindarî yan jî dê bibe redkarî. Tu nirxa vê yekê jî nabe. Mirov tenê rastiyan jî berhev bike, ev dê bibin bîranîn. Çi kir û çi nekir? Bîranîn jî roman ne, çîrok e.

Rast ne çîroke jî, nêzî çîrokê ye. Ger tu nêzî çîrokê binivisînî jî nabe roman. Hevalên me çîrokan baş dinivisînin. Heta nivîskarên me jî hene. Lê nikarine romanan binivisînin. Ji ber ku divê mirov hindek tiştan li ser romanê zêde bike. Ger hun bixwazin dîroka xirab binivisînin, pêwîste hun

bixuliqînin. Ya xirab çawa dikeve tengasiyê û dawiya wî çi dibe? Ev xebata we ye, hunera we ye û wêjeya we ye. Ez jî qehremanê romanekê me. Ma serokatiyê dike, ma tiştên baş dike, ma hindek tiştan dişemitîne, ma hindek tiştan ji rê derdixe? Ger ev yek wisa bidome, dikare xwe belavela bike, dê bibe mijara rexneyê. Tu dikarî van hetanî dawiyê jî vebikî. Ji vê yekê re jî rûpelekê vebike.

Ji beriya van divê tu weke zanistekî rasteqîniyê derbixînî rastê. Dîroka zanistê çawa bûyeran derdixe rastê, divê tu jî wisa bî. Piştre jî tuyê hindek tiştan ji ber xwe ve lê zêde bikî. Ger tu nikarîbî, tu tiştan ji ber xwe li ser zêde bikî, wê demê tuyê bibî, çîrokvan an jî çîrokbêj. Ji bo romanê divê tu destpêkê kûrahiya şoreşê fêm bikî û piştre hindek tiştan ji cem xwe lê zêde bikî. Mînak di vê mijarê de wêjeya Rusan gelekî dewlemend e. Çernîşevskî, Dostoyevskî, Tolstoy gelekî mezin in. Ez texmîn dikim ku, ev xalên ku min gotine di romana wan de hene.

Fransa jî xwedî romanên wisa ye. Di Îslamiyetê de jî hene. Min nexwend, lê di Îslamiyetê de bûyera **Nech'ûl Belaxa** heye, belkî teknîka wê nîne lê weke romanekê ye.

Di rastiya şoreşê de tiştên ne baş jî hene. Gelek tiştên neyinî û şaş jî qewimîne. Ger mirov weke rastiya wêje û şoreşê bi nav bike, dê baştir bibe. Divê bînim ser ziman ku ka şoreşê çi li ser wêjeyê zêde kiriye. Şoreşeke bêwêje dişibe mirovekî tazî, bi kîretî dimeşe. Wêje bedewiya şoreşê ye. Şoreşeke bêwêje dişibe mirovekî kirêt.

Weke nanê bêxwê, weke mirovekî nizane cil û bergan li ber xwe bike, weke mirovekî nizanibe xîtabekê bike. Li gor

dîtina min, wêje xîtaba şoreşê ye. Bi qandî ku gelekî hewce ye, her wiha gelekî jî dewlemend e. Gelek kêmaniya jê dibe. Hindekî jî ji ber vê yekê jê re edebiyat tê gotin, lê bi piranî edeb e. Wêje bi giştî ji bo şoreşê hewce ye. Lê ji bo şoreşê edeb hewcetir e. Şoreşa ku xwe venegerîne wêjeyê, dikeve nava kêmaniyeke mezin. Ger wêjeyek jî xwe veneguherîne şoreşê dikeve. Dibe ku şoreş bêwêje xwe bide meşandin, lê wêje bêşoreş nameşe.

***Divê mirov binivisîne, lê dagirtî binivisîne, di cih de û rast binivisîne. Misoger divê mirov li ser şoreşa Kurdistanê berhemên pir biha biafrîne***

# Destpêka Romanê Pêwendî Ye

Dê li Kurdistanê roman li ser kîjan bingehan were nivîsandin. Hun dizanin, weke carên bêrê yên dîroknasekî, bidestgirtineke weke çawaniya xebatên siyasî û çawaniya rewşa Kurdistanê ne di cih de ye. Destpêka wê pêwendiyek e. Mînak ger tu dixwazî di derbarê min de binivisînî, ji jiyana min a niha zêdetir divê tu ji zaroktiya min ve dest pê bikî. Tu dikarî ji pêwendiya min a bi vî û wî re, her wiha ji pêwendiya min a bi jinekê re dest pê bikî. Tenê bi du peyvên weke keçeke wisa yan jî mirovekî wisa ve dikarî destpêkê baş bikî. Di encam de jî tu dikarî xwe bigihînî deryayeke mezin. Ev jî pêşniyareke min a ji we re ye: hindek xal hene, ger hun bikaribin van rast bigrin, hun dikarin dilê Kurdan bi dest bixin. Ez ji vê yekê re dibêjim, girêkora Kurd. Girêkora Kurd çi ye? Weke civakî tiştên me bal kişande ser in.

Hindek têgîn avabûne, ev xebatên wêjeyê ne. Mînak kuştina zilam, kuştina zilamê Kurd, kuştina jina Kurd... ev biwêjên girîng in. “Siya Evînê.” Ji beriya van hemûyan ger hun mirina evîna Kurd bînin ser ziman hun dikarin romanekê binivisînin. Gelo ma zemîna evînê heye yan tune ye? Divê hun vê yekê pir vekolin. Em Ehmedê Xanî ji vê yekê re bikin mînak; em Mem û Zînê, yên li dora wan bifikirin. Şerkirin, di dawiyê de her kes şewitî. Zînê nedikarî du peyvan bibêje, Mem jî wisa bû, di dawiyê de her du jî şewitîn. Yek jî Mem melik bû, nedikarî ji zindanê derbikeve, nedikarî destên xwe dirêjî Zînê bike. Ehmedê Xanî di vê derê de tiştekî baş dike. Evîna Kurd nemeşiya. Kî ji vê yekê re asteng bû? Feodalîzm û axatiya Kurdan asteng bû. Ev baş

li hev anîne û baş nivîsandine. Di dawiyê de jî dişewitin ne wisa?

Niha em jî nabêjin ku hun jî bişewitînin. Ev yek di Tirkan de zêde ye, hetanî di Ereban de jî heye. Mesela Leyla û Mecnun gelekî navdar in. Di şoreşa me de hindek tiştên ji şewitandinê wêdetir hene. Di Zîlanê de diyardeyên jiyanê hene. Xalên banga jiyaneke mezin hene. Van bi xwe tîne ser ziman. Digot, “ez jiyana mezin dixwazim, ez ji jiyana kevin a jinê nefret dikim, egîdiyê dixwazim, tekoşînê dixwazim.” Jixwe ev jî pêk anîn. Xebateke gelekî mezin kir. Tekoşîna mezin evîna mezin derxistê rastê. Bi xwe dema ku diçe wiha dibêje: “dema ez vê çalakiyê pêk tînim, hemû cîhan dibe ya min, di asteke pir bilind de nêzî jiyanê dibim.” Ev hemû rasteqîn in, divê em pir dorfireh li ser van xalan rawestin. Ger tu bikaribî vê girêkorê vebikî, tuyê tekoşîna mezin bibînî, tuyê evîna mezin, egîdiyê, serkeftinê, bedewiya mezin bibînî, tuyê rêxistiniyê, wekheviyê û xweşikiya welat bibînî.

Ger dema min hebûya min dikarî ez li ser rawestim. Divê mirov bike roman. Ciwanên me hene, di heştdeh saliya xwe de ciwanên di şerên dijwar de diqewirin hene. Di kîjan astê de kêmaniyên wan hene. Rexmî ku bavekî wan ê xwedî xirs nîne çawa ev lawik derketine? Ez çawa derketim, min çawa wêrekî raber kir? Min ew ciwan ji dê û bavê wî qetand, şande nava dijwariya şer, şewitî, sedema vê çi bû? Wê demê tuyê xwe dirêjî, dîrok û civaka Kurdan bikî. Dê û bavê çima ji bo lawê xwe welatek çênekirin. Divê mirov van xalan baş fêm bike. Çima ev zarokên xwe li gel xwe nikarîbûn îdare bikin, zarokên wan derketin çiyê? Di romanê de tuyê cihekî

pir dorfireh bidî van. Ger tu wisa nekî, tuyê nikaribî ciwanekî qehreman bînî ser ziman. Tuyê nikaribî ji keçikekê fêm bikî.

Mirov dibîne ku her dem naşewitîne, her dem ji gewriya xwe "jiyana azad" diqêrîne. Li serê çiyan xwe bi çekan ve xemilandine û xwedî derfetên jiyana azad in jî. Tevî kêmahiyan, divê mirov van jî kûr vebêje. Ev yek bi serê xwe mijara romanekê ye. Derfetên jiyana azad çi ne? Ji bo Kurdan, ji bo dîrokeke ketî, ji bo dijminê ku jiyan kirêt kiriye, nirxa vê jiyana azad çi qas e? Divê tu vê yekê wisa baş bînî ser ziman ku, bi hezaran kes, bi îmaneke mezin ve, bi rêzdariyeke mezin ve xwe bigihîne van çiyan. Bila tenê bikaribin ji bo jiyaneke azad û wekhev vê yekê pêk bînin.

Ji aliyê din ve mirov dikare li ser rêxistinê û derûniyê raweste. Di romanê de tiştên wisa jî hene. Mirov dikare ji dîrokê hindek mînakan berpêş bike. Mirov dikare ji Napoleon hindek mînakan bide. Mesela Çernîşevskî baş e. Ji aliyê din ve Îskender çi kir, Hz. Elî çi kir? Her wiha gelekî aliyên wê hene ku mirov dikare pê ve girêdanê çêbike û jê sudê werbigre. Ev yek bi qandî bi şoreşê ve girêdayî ye, bi bedewiyê, bi başiyê, bi dijmin ve, bi kirêtiyê ve jî girêdayî ye. Ez dibêjim ku rastiya romanê ev e. Lê divê mirov van xalan hemûyan bi cidî bi dest bigre. Wisa ye, girêkoreke pir kûr e, girêkoreke xwedî rakêşiya hemû jiyanê ye. Diguherîne, dikişîne, dixîne. Ger hun li ser vê çerçoveyê rawestin, ez bawer dikim dê romana Kurdan bigihê astekê.

Divê mirov binivisîne, lê dagirtî binivisîne, di cih de û rast binivisîne. Misoger divê mirov li ser şoreşa Kurdistanê

berhemên pir biha biafrîne. Gelek mijarên ji bo nivîsandinê hene, mirov dikare li ser serpêhatiyan, li ser wêjeyê, li ser komûnîstan, şoreşgeran. Mirov dikare romanên pir giranbiha derbixe rastê. Ger yek bikaribe romana Kurdan xwe binivisîne dikare xelata Nobelê werbigre. Cîhan li benda Nobela Kurdan e. Ma hun dizanin Yaşar Kemal çima xelata Nobelê nagre? Ji ber ku li ser rastiya Kurdan nanivisîne. Tenê di asteke diyar de li ser rastiya Kurd radiweste. Jixwe ji ber wê rastiyêye ku nagihê asta berendamtiyê jî. Ger rasteqînan rast binivisîne pêkane ku bidinê. Lê ditirse, dibêje "ger ez peyvekê binivisînim dê min bikujin." Ev kesayet nikare xelatê bistîne. Bistîne jî tu nirxa wê tune ye.

Vê gavê cîhan amade ye, romana ku bikaribe di cîhanê de cihê xwe bigre romana Kurd e. Rastiya hatiye gotin ku, wêjeya Kurdî weke axeke nehatiye ajotin e, mirov çiqas bajo, lê binêre dê ewqas hilberînê bide. Ev yek karê we ye. Ez dixwazim li vir bangekê bikim. Van rastiyan hemûyan berhev bikin û li ser vê bingehê xwe xurt bikin. Mejî û dilê we birçî ye. Min axa bejî çand, rast e. Gelek tişt lê şîn dibin. Vê yekê ji bo dewlemendiya we bi xwe vebikin. Ez ji rewşenbîrên Kurd, ji nivîskarên Kurd vê yekê dixwazim. Ger ez jî li ser nexebitim, tu nirxa min jî nabe.

Dem dema şoreşê ye, dem dema hunerê ye. Ji bo teşvîkirinê mirov dikare bêşbirkeke pirtuka salê pêş bixîne. Di warê helbestê de, di warê çîrokê de, hetanî di warê dîrok û zanistiyê de jî dibe. Mirov dikare romana herî baş a salê hilbijêre. Pêşbirkeke wisa dê baş bibe. Ronakbîr dikarin komîteyekê damezrînin, dikarin hindek bendan ava bikin. Çawa, di kîjan dîrokê de, di bin kîjan navî de, di kîjan mijara

wêjeyê de pirtûka herî xweş? Kî bixwaze xebateke wisa dest pê bike emê misoger piştgiriya wan bikin.

Waneya yekem a ku ez didim destpêkek e. Êdî tevger û şoreşa wêjeyê dest pê dike. Hun ziman û çanda Kurdî pêş dixin ev yek xwedî nirxekê ye. Lê di aliyê wêjeya şoreşê de kêmanî hene. Ez nabêjim bi yekcarî xwe bi şoreşê ve bidin girêdan, lê rastiyeke şoreşê ya ku divê mirov xwe pê ve girê bide jî heye. Ji bo wê yekê divê her wêjevan qada xwe ya xebatê dorfireh bike. Hun dikarin bigerin, pêwendiyan bi pêş bixînin. Hemû rewşenbîr dikarin di vê mijarê de kêmaniyên xwe bibînin û xwe careke din di ber çavan re derbas bikin. Ji bo pêşvexistina xebatê gelek derfet hatine afirandin. Erdekî bejî ye, nehatiye bikaranîn, bi kar bînin û nirx bidinê. Gelek kulîlk jî şîn dibin, divê mirov van kulîlkan jî nas bike. Hindek tişt diqedin, hindek nû digihên. Divê mirov van hemuyan nas bike.

Mirov dikare niha gava vê ya destpêkê biavêje. Divê ji vê û şûn ve bi evîneke mezin ve xwedî wêrekî bin. Bila di dilê rewşenbîrên me de hindek evîn şîn werin. Tenê nebêjin, jin û zarok. Bibêjin çi li evîna min hat. Ger evîna me mezin be, dê hemû pirsgirêkên we yên jin û pereyan jî çareser bibin. Li ser evîna Kurd rawestin. Evîn weke min gotiye. Bi çavekî kûr ve li dîrokê temaşe bikin, li bûyerên zirav temaşe bikin. Li kesayetên xwe bi xwe temaşe bikin. Qehremanên me jî mezin in. Li gel aliyên xwe yên nebes û kêm bi aliyên xwe yên xweşik ve mezin in. Ev kirêtên xwe jî bi Ewrûpayê ve naguherim. Ez vê yekê bi taybet destnîşan bikim. Ev bi giştî xebatên rewşenbîran in, divê hun van tiştan bibînin. Divê

rewşenbîr van xebatan bidin meşandin. Ez vê xebatê didim meşandin û vê bangê dikim.

Ez carake din dubare dibêjim hindekî wêrek bin.

Ji bo romanê tiştên ku ez destnîşan bikim ev in. Di rastiya civakan de wêje her dem bûye xwedî cihekî girîng. Civakên bêedeb û bêwêje nabin, tune ne. Rastiya civakekê, her wiha rastiya gelekî misoger her dem şertê edebê jî bi xwe derdixîne holê. Navê wî li ser e, yanî tê wateya civakê bi edebiyatê ve hatiye terbiyekirin.

Weke ku dijmin her xwestiye di nava dîrokê de Kurdan bêsiyaset, bêaborî û bêdîrok bihêle, her wiha xwestiye bêwêje jî bihêle. Ji teşeyê bêwêje, bêirfan û lihevkarî jî, tu caran wêrankarî kêm nekiriye. Di roja me de, mêtîngeriya wêjeyê jî pir xaleke li pêş e. Ev jî sekneke sosret e. Gelo ma li ser rastiya wêjeya Kurd texrîbkariya mêtîngeriyê çi qas e? Yek jî cureyeke pir sosret derketiye holê. Mirov dê karibe rewşa hindek Kurdên ku di huner û bi taybet di wêjeya Tirkî de rol girtine çawa bi dest bigre? Ev dikevin hundirê wêjeya Tirk an jî dikevin hundirê wêjeya mêtînger ên hindekên din?

Ez ji aliyê destpêkê ve dixwazim destnîşan bikim. Emê van di hundirê wêjeya Kurdî de bikaribin bixin kîjan kategoriyê. Ez dikarim hema mînakan jî bidim. Helbestvanê mezin ê wêjeya Ereban Kurd e. Ez bawerim navê wî Ehmed Şevkî bû. Di wêjeya Tirkan de Ehmed Arîf, di sînemayê de Yilmaz Guney, di romanê de Yaşar Kemal û hîna gelek kesên ku nayên bîra min an jî naxwazim bi nav bikim hene. Rexmî ku esas Kurd e, wêjevanên herî dariçav ên netewa serdest in. Mêtîngerî li ser wêjeyê jî xwedî gotineke mezin e.

Asîmîlasyonîst e û hetanî dawiyê jî, berovajîkar e. Pêwîst dike ku mirov ronî bike. Gelo mirov dikare çawa rola wan a li ser wêjeya Kurdistana wêranbûyî rave bike? Ma haya wan ji vê yekê heye yan na? Bersiva ku ji van pirsan re were dayîn, dê bi muqayesê re derbikeve holê.

Ji kirûyên herî bingehîn ên ku şoreşa Fransayê û şoreşa Rusyayê derxistine yek jê jî wêje ye. Amadebûyîna şoreşa Fransayê, amadebûyîna wêjeyekê ye. Ji felsefeya wê re dibêjin felsefeya Ronakiyê. Ew pêwajoya hewlnak a romanî weke hîmê bingehîn ê şoreşê ye. Pêkane ku mirov ji bo şoreşa Rusan jî heman tiştan bibêje. Mirov nikare şoreşa Rusyayê bêyî Tolstoy, Dostoyevskî, Gorkî û Puşkîn bihizire. Li Rojhilatanavîn jî pêşketinên weke van hene. Li gor uslubên xwe xwedî wêje ne.

Îro di şoreşa Îslamê de xitabet gelekî bihêz e. Zimanê wêjevanên berê yên Ereb jî, hetanî zimanê Quranê jî zimanê wêjeyê ye, him jî zimanê helbestî ye. Gelo ger em nîqaşeke bi navê Quran û wêje vebikin, emê karibin ji bo nirxa wêjeyî ya Quranê çi bibêjin? Ez pir zêde li ser vê yekê ranewestiyam. Lê ya ku divê destpêkê were gotin, Quran esereke erjeng a wêjeyî ye. Weke romanê ye, weke pirtûka helbestan e. Zimanê herî bihêz a axaftina vekirî ye (belagat). Quran bi serê xwe bûyereke wêjeyê ye. Mirov dikare hemû klasîkên Îslamê weke sereke eserên wêjeyî bihizire. Di navbera Îslamiyet û wêjeyê de pêwendiyeke pir rewneq heye. Divê mirov vê yekê bigihînê ronahiyê. Pir sûdwere ku mirov bi pîvanên hemdem ên roja me nêzî wêjeya Îslamê ya serdema navîn û eserên ji aliyê kesên xwedî ilm û irfan bibe. Em ji Xewroşkên Hezarûyek Şevan bigrin hetanî bi

Siyasetnameyê, ji Şahnameya Firdewsî bigrin hetanî Mesneviya Mewlana, eserên nîvromanî ne û pir semyan in.

Mixabin ji ber ku bi giştî derveyî ronakbîrên Ewrûpa hemû ronakbîr xwedî kompleksên biçûkahiyê ne, di van aliyan de rastiyên xwe yên dîrokî lêkolîn nakin. Ev yek ji aliyê ronakbîrên gelerî yên Rojhilatanavîn ve jî wisa ye. Li gor min xwedî gelek mîtolojî, efsane û klasîkên dewlemend in. Pir zêde derfeta min a lêkolîna ser wêjeya Kurdî çênebû, lê yên ku tespît bûne hene. Mînak helbestên Feqiyê Teyran hene, dîsa Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi zimanê xwe yê helbestî ve esas romanek e.

Li gel ku gelê Kurd jî ji gelên herî kevnare yên Rojhilatanavîn e, xwedî kevneşopiyeke dewlemend a wêjeyê ye. Ez ji bo ku gelê Tirk biçûk bibînim namêjim; lê ger emê yeqîn behsa gelekî bêwêje bikin, ev gelê Tirk e. Ji aliyê şekilgirtina dîrokî ve jî, bi wêjeya xwe ve Kurd gelekî herî zêde xwedî şekilgirtineke baş e. Lêkolînkirina vê yekê li ser milên wêjevanan e. Şekilgirtina gelê Kurd a wêjeyî kengê dest pê dike û çawa hetanî roja me ya îro hatiye? Ev mijareke cewaz a lêkolînê ye. Lê li gor tespîtên min ên yekem, di şekilgirtina civakê de edeba Kurdan bi serê xwe roleke mezin dilêyîze. Belkî devkî ye, belkî folklorîk e, lê gelekî girîng e. Ji gelek aliyan ve, him ji gelê Tirk û him jî ji gelê Ereb bêhtir hatiye terbiyekirin. Ji aliyê siyasî ve hatiye wêrankirin, zanebûna wî ya dîrokî hatiye tunekirin. Lê dema em li hindek taybetmendiyên rasteqîniya gelê Kurd temaşe bikin, mirov dikare eşkere bibîne ku xwedî wêjeyeke bihêz in. Ez naxwazim van mijaran zêde vebikim, ji ber ku ez pispor nînim.

Gelo rasteqîniya wêjeya gelê Kurd çi ye, di nava serdeman de çawa şekil girtiye, ger bêedebiyek hebe kê rê li ber vê yekê vekiriye? Ger hindek rewşenbîrên Kurd, di derbarê dîrok û wêjeyê de xwedî lêkolîn bin, dikarin di hundirê rasteqîniya civakî û siyasî de, bi zanistî lê hûr bibin û bigihên hindek diyarde û nirxandinan. Li Kurdistana ku ketiye pêvajoya şorêşê de mirov dikare di mijara edeb, wêje û weke îfadeya herî nûjen romanê de çi bibêje? Ez bawerim di nava rewşenbîran de li ser mijarên pêkaniya wêjeya Kurd û bi taybet li ser çawanivîsîna romana Kurd nîqaş tên meşandin.

Dema em dibêjin şêwaza ziman û îfadeya şoreşê, em naxwazin vebêjin ku ka dê bi Kurdî be yan dê Tirkî be. Em wergirîtir bidest digirin. Ez dixwazim pirsgirêka wêjeya Kurdî bi kurtasî bilêv bikim. A ku ez dixwazim li vê derê vebêjim di şêwaza ziman û îfadeyê de kes nikariye bibe dilê şoreşê. Divê misoger şêwazeke vebêja dilê şoreşê hebe. Ev yek ji bo me jî derbasdar e. Di şer de hevalên me nagihêne kurahiya dil. Bêguman dil gelekî ziwa ne, dil hindekî bi çandê, wêjeyê, helbestê, stranê, û kevneşopiyê xwedî dibe. Ciwaniya serdemê ji van hemûyan qut e. Tevkûjiyeke mitingerî ya hewlnak jiyane. Ji bo ku ez wan ji vî alî ve tewanbar bikim nabêjim. Tevkujiyeke dil a mezin hatiye jiyîn. Helbesta ku li zimanê xwe lefandine helbesta derewê ye. Romana ku dixwînin tenê ji bo pêşvexistina tevlîheviya hiş e. Yan jî asta wan a çandî ji tevlîheviya hişan wêdatir nikare tu tiştan bike. Dilwêrekiya wan hema weke ya

xayînekî ye. Ji ber ku tişta bi navê dil a dane wan, ji ya xayînekî bêferxtir e.

Emê mirovê Kurd çawa bigihînin dilekî? Kûrahiya dil, hesasiyeta dil dê çawa derbikeve holê? Ev mijareke bi serê xwe ye. Mirov dikare li ser vê yekê qebîliyeta temaşeyê û baş bihîstinê zêde bike. Ev mijarên hunerê û wêjeyê ne. Lê destpêkê dilê me yê ku hestên me bizanibe lazim e. Ez gelek caran vê yekê dipirsim: dema ku hun li van çiyayên rewneq digerin, heta hemû zindiyên ku hun li wir dijîn dibînin, hun çima peroş nabin? Mînak surên Amedê, mirov dikare bi şêweyekê cudatir ji ya dîtina Amediyan bibîne. Kî hat û kî çû di ser wan latan re... Her wiha ew erdnîgariya erjeng bi serê xwe her dem gobilîneke romanî bi ser dilê mirovan de dike. Van tiştan hemûyan nabihîsin. Pir balkêş e, tu kesekî ku bibêje “ez gelekî bi kûrahî ji welatê xwe bandor dibim” nîne. Ew derûniya revê ya dijmin hîna pir serdest e. Mesela ger min bi zînciran jî girê bidin, ez nikarim li Ewrûpa rihet bikim. Ji ber ku ez li vê derê ji bo armanca xwe derfeta xebatê dibînim, rihet radiwestim. Weke din ez dîn dibim. Gelo rewşenbîrên me çawa li Ewrûpayê dikarine rihet bikin? Ez nabêjim ku mirov nikare fizîkî bimîne, ya mijara gotinê ye ne ev yek e. Li şûna ku mirov dê rastî tevkujiyan were, dibe ku mirov li mişextiyan bijî û dikare gelek xebatên xwedî nirx jî bike. Ya ku ez di vê derê de dibêjim cewaztir e.

Dil û vebêja we çawa bêwelat dimîne? Hun çawa dikarine wisa bi dilekî rihet bijîn? Ez vê yekê ji gelê me re jî dibêjim. Ji ber sedemên aborî û hereşeyên tevkujiyê ez wate didim goçberiya wan. Lê bi demê re xalên weke firotina dilê xwe, pazarkirin û bêpemeniya ji dil ez xetertir dibînim. Ger

rewşa we ya hesabpirsîna ji tevkujîkarekî nîne, dîsa ger we hêlîna xwe, welatê xwe ji bîra kiriye, ezê ji mirovbûna we bikevim gumanê. Wê demê dixwazî zilamekî zanistî be, dixwazî li Ewrûpa yekî super be, ji bo min du qiruş nirxa wî jî nabe. Ez yek jî ji vî alî ve dinirxînim. Yanî em ji azadbûna wijdan û aqil bigerin, ji çend cihan ve hatiye zîncirkirin. Bêguman ev yek jî wan gelekî bêhilberîn dihêle. Ger dil û wijdana te azad nebe, tu şarezayiyên te bi pêş nakevin. Ez gelek caran ji xwe dipirsim, ka ezê çawa bikaribim vê yekê ji holê rabikim. Ev şoreş jixwe bersiva vê ya herî balkêş e.

Ez him xwedî armanc, him xwedî hêvî û him jî xwedî hêrs im. Ez neçarim ji van re riya derketinê bibînim. Pêşveçûyînên min ên dawiyê di nirxa wêjeyê de ne. Bi vî alî ve, li ser ev xalên min bi lêv kirine, tenê di zimanê nivîskî de ne, di zimanê helbestê de, di zimanê jiyanê de û di zimanê tevgerê de ez serketîtir im. Hun şoreşên din dizanin, belkî bi dehsalan xwe bi wêjeyê xwedî kirin. Mesela şoreşa Fransayê pêncî salan berê amade bûye, ya Rusan sî salan berê amade bûye. Di Kurdan de ev bûyer nabe. Dema tu bi Kurd tiştekî bidî nivîsandin, weke ku tu pişta wî bişkînî, te ew ceza kiriye. Lewra divê tu him teoriyê û him jî çalakiya wî bi hev re bikî. Tuyê him bibî dilê wî û him jî bibî agirê wî. Dê hemû bi hev re bin. Ev yek taybetmendiyeke şoreşa Kurdan e. Yên ku tênegihiştine dema ku lêkolîn bikin, dikarin hîn bibin ku ka ez dixwazim çi bibêjim. Yanî em nikarin bibêjin, ka em destpêkê wêjeya Kurdî bikin û piştre emê şoreşê bikin. Ji ber ku mêtînger ji bo bi te tu gotinan nede kirinê xwe rêkûpêk kiriye. Ji kerema xwe ez dixwazim ku hun vê yekê fêm bikin. Beramberiya axafîna tu peyvên Kurdî

darvekirin e. Ha te guleyek teqandiye, ha te peyveke Kurdî axiviye, ev yek bi heman cezayê tê bersivandin. Lewma ji bo Kurdan emê bi hev re şêwaza îfadeyê çêbikin. Tu aliyê vê yekê nîne. Ez dixwazim hindekî vê yekê pêk bînim û ez gelekî jî digihêm encamên balkêş.

Ez hizirîm em dikarin di salvegera 300. a nivîsandina **Ehmedê Xanî** ya **Mem û Zînê** de çi bikin. Lewra di dahûrînên xwe de min hindekî bal kişande ser vê yekê. Encamên ku ez gihame, ev yek bi min dan gotin: eger bi rasteqînî û zanistî were nirxandin, ew serdem di giştiya cîhanê de destpêka serdema netewbûnê ye, dîsa serdema pêşveketina hêrsa li dij darezînên nirxên feodaliyê ye. Ehmedê Xanî jî bi sedema ku rewşenbîrek e, ne pêkane ji van pêşketinan û hewceyiya netewbûna Kurdan bêxeber be. Di Ereban de, di Eceman de, û di Tirkan de qraltî yan jî siltaniyên rola yekgirtinê dilêyîzin pir xwedî hêz in. Di Kurdan de ev bûyer nîne. Rejîma qraltiyê di netewbûnê de xwedî cihekî pir girîng e. Qral li hember mîrîtiyan ji bo gelbûn û netewebûnê dibine bandoreke yekgirtinê ya xurt. Di wê demê de li Ewrûpayê serdema qraltiyê heye, dîsa qralên Îranê hene. Di Kurdan de ev yek nîne.

Ehmedê Xanî texrîbatên begtiya feodal a li ser binkeya me ya civakî vedibêje; çawa dil parçe kirine, çawa negihandine hev, van rastiyan vedibêje. Hun ew dilê wê derê weke **dilê netewî** bi dest bigrin, mijar ew e. Ger ev yek di şexsê Mem û Zînê de hatibe ser ziman jî, hêmaneke yekgirtinê, hêmaneke dil heye. Lê lîtava feodal tu caran vê yekê pêkan nake. Di nava janên mezin de dimînin. Pêknehatina vê evînê weke pêknehatina yekîtiya Kurd û dilê

Kurdan dinirxîne. Yek du hêzên serdest ên wê serdemê dikevin hewla ji hev veqetandina wan. Lê feodal jî di zîndanê de dirûxe.

Encamên ku divê hun ji vê rastiyê derbixin ew e, dilê Kurd ji beriya vê bi sêsed salan jî nayê avakirin. Mêtîngerî hetanî roja îro dijwar nîne, bi Kurdî dinivisîne û Mîrîtiya Botanê tam weke mîrîtiyeke Kurdan e. Lê rexmî vê yekê jî li pêşiya yekbûna netew û dilê netewî astengî hene. Di Mem û Zînê de ev yek pir giranbiha hatiye ser ziman. Di wê derê de wêje heye, pêşveçûna wê demê pir hewlnak vedibêje. Jan û êşên gel pir hewlnak tîne ser ziman. Lê li gor min lêkolîn û nirxandina vê yekê rast nayê kirin.

Ez hiziriyam, gelo ma rewşa sêsed salan paşê çawa ne? Tespîta yekem min zelal kiriye, tu ferxa yên me jî ji Mem û Zînê nîne. Li holê Ehmedên Xanî nînin. Tenê li çiyan bi erzanî jiyana xwe ji dest didine û dimirine. Ji beriya sêsed salan lêdana dilên wan semyantir e. Gelekî şerê jiyanê didin. Ger bi pîvanên feodaliyê be jî, berxwedana wan gelekî girîng e. Yê me ji bo tunehiyekê, ber bi mirinê ve direve. Dil gelekî ziwa ne, tu kes sedema vê yekê jî qet napirse. Niha dengvedanên erdnîgariyê jî qet nayên ser ziman. Piştî ku sêsed sal derbasbûn şûnve, hewla tunekirinê ya li ser dil gihiştiye sifirê. Encamê nagre.

Min wijdana xwe jî azad kir û nefirot. Ev yek ji bo min peyveke girîng e, û min gelekî peroş dike. Ez bi bêhna axê, bi ewrên baranê, bi brûskan, bi keskesorê û bi dengê çivîkan peroş dibim.

# Divê Evîn Weke Têgîneke Bingehîn A Wêjeyê Were Hizirîn

Ger ez niha xwe weke wêjevanê herî sereke binirxînim, ez çi dikim? Min çîroka xwe ya bi dayika xwe re vegot. Min pêwendiyên xwe yên bi mirovê Kurd re vegotin. Min pêwendiyên xwe yên bi axa Kurd re vegotin. Ez mirovekî wisa me, têkîliyên min bi xwezayê re gelekî li pêş in. Ger ez pir awarte bi mirovê Kurd re eleqeder nebûma, jixwe me nedikarî em vê rêxistinê û vî şerî derbixin holê. Ma pêkanbû ku tu guleyekê biteqînî? Ev qas keçên ciwan, ciwanmêr hene, di vê mijarê de rewşa herî xeternak dijîn. Hiştina li derveyî vê yekê bi serê xwe şarezayiyekê hewce dike. Terbiyekirina wan, kirina xwediyê edebekê hewleke gelekî girîng e. Divê mirov vê yekê di wategirtina wêjeyê de weke hewleke girîng binirxîne.

Ez li ser têgîna **Evînê** jî radiwestim. Divê ev yek weke têgîneke herî bingehîn a wêjeyê were hizirandin. Divê di vê mijarê de em Mem û Zînê ronî bikin. Hewceye ez eşkere bibêjim; hestyariyên niha peyda dibin, her dem nefreta min kişandine ser xwe. Mînak di nava gelê me de beşekî kadro yê herî xwe şoreşger dihesibîne, wexta hindek pereyan bi dest dixe û jinekê dibîne, ya ku siftê tê bîra wî rêxistinkirina revê ye. Çima ev yek min gelekî bandor dike? Dikarîbû wî pereyî ji bo hevalekî xwe jî pir baş xerc bikira. Dikarîbû bi wê jinê re di nava refên me de riyên hezkariyeke xweşik raxîne. Çima bêyî ku li ser van xalan bihizire, hema revê tînê bîra xwe? Dê biçe kû derê? Zêde cihekî ku biçê jî nîne. Dê herin himbêza polîs, çend rojan ew ajoyên xwe yên çors bijîn, piştre dê werin lêdan û werin avêtinê. Xala ez pê hêrs

dibim, ev yek e. Şarezayiya wan a hezkirinê nîne. Xweziya we kariba hez bikira, minê hetanî dawiyê xizmeta we kiriba. Niha hindekî rastiya Kurd ev e. Evîna wî nîne, dilê wî nîne. Tenê tişta ku ji destên wî tê, derfetan li ser bingehê xiyanetê bi kar tîne. Niha divê em vê çareser bikin.

Ev mînakek e, lê rastiya me ya netewî ji sedî nod wisa ye. Li vê derê jinên ku xwedî ziman in, tên pêşxistin. Ji her alî ve jinên ku dikarin li ser piyên xwe bimeşin tên pêşxistin. Bi koleyan ve bizimanîbûn nabe. Ziman û dilê koleyan nabe. Zimanê kesekî ku hişk bi pergalê ve hatiye girêdan nabe. Ger wê bigre, ma dê bi çend qirûşan be? ma ji zayendiya çors çi derdikeve? Ez vî qasî eşkere dibêjim. Hîna xwe nedayîna ber fêmkirinê heye. Di bûyera Kurd de têkîlî klasîk e. Divê wêjevan li ser vê yekê raweste.

Hewceye ez diyardeyekê destnîşan bikim. Dema mirov wêjeyê pêş dixîne, tenê di pêvajoya serûbinbûna şoreşê de ne, divê ji beriya wê em kesayeta tarî, ya bêçareserî, ya ji dil ve hatiye zincîrkirin, ya gelek caran dilê wê hatiye tunekirin, eşkere bikin. Em di çalakiyên din ên hunerê de jî û di romanê de divê mirov li ser van raweste. Di romanê de emê **Kurdê qedî** çawa pênase bikin? Kurd çawa hate qedandin? Ger dê romaneke ji çend cildan çêbibe, divê cildek ji vê re were veqetandin. Kurdê qediyayî, Kurdê evqas ketî, Kurdê têkçûyî, Kurdê bûye çehl, Kurdê reviyayî, Kurdê ev qas bi erzanî ji axa xwe diqere û Kurdê ku têkîliyê ev qas kirêt dike kî ye? Çawa kete vê rewşê? Xala yekem ev e.

Ya duyem, ma **berxwedan** pêkan e? Ma pêkane em bangî wî ye ji hezkirin û tekoşînê re bikin? Ma derfeta ji têkçûnê gihandina serkeftinê, ya ji bêdiliyê gihandina wêrekiyê, ya ji

kirêtiyê gihandina bedewiyê heye? Tuyê çawa rabikî? Tuyê li dijminê ku ew xistiye vê rewşê temaşe bikî. Tuyê ev şerê xwe li dij dijmin bimeşînî. Tuyê bibêjî dijminê gelê Kurd bibîne. Destpêkê tuyê bangî dîtinê bikî. Piştre ger derfeta te ya berxwedanê heye, berxwe bide. Gotina "berxwedan jiyane" vala nehatiye gotin. Ev yek şert e, **jiyankirin berxwedan** e, berxwedan jiyan e. Ev gelekî girîng e û divê mirov rêzdariyeke mezin raberî vê bike. Tenê berxwedan jî têr nake, êrîşa ber bi serkeftinê dibe jî gelekî girîng e. Ji hemû eniyan ve derbasî êrîşê dibim. Ger ev kes ber bi serkeftinê ve neçe, xwarina dixwe jî heram e. Tuyê bi vî nedî xwarin û vexwarin, tuyê nedî razîn, tuyê her dem li ser stiriyan rabigrî.

Dema tu Kurdê nû diafrînî, ji bo bi destxistina hindek mafan, hewceyiya te bi hindek serkeftinan heye. Azîneyên min li ser vê hîmê ne. Ji ber ku weke din riyên vê yekê nînin. Ez vê yekê herî zêde li ser xwe pêk tînim. Bi rêxistinê û çalakiyê ve amade bike, demdirêj bide jiyîn û rê li pêşiya gelek serkeftinên girîng vebike. Ger tu bikaribî van bikî, tu dikarî rihet bî. Ev yek şert e! Bêyî afirandina vî Kurdî, her tişt heram e, her tişt ketibûn e.

## Pêşvexistina Hezkirina Kurd Peywira Wêjeya Kurd e.

Pêşvexistina hezkirina Kurd û şêwaza jiyana Kurd sereke peywirên wêjeya Kurd e. Balkêşkirin, xweşikirin, wêrekirin, û da ecibandina jiyanê, sereke peywirên helbest, wêne û muzîkê ne. Lûtkeya wê evîn e, bêguman ger em bikaribin pêk bînin. Ez li dij evînê nînim. Berovajiyê wê, weke hêza afirandêr a mezin ez xwe dinirxînim. Hun dê bibêjin çawa? Çawaniya wê kêm zêde bi vî şerî ve hatiye bersivandin. Ez naxwazim bi hêsanî dev ji vî gelî û van axan berdim. Ji bo vê yekê li dij dijmin şerekî dijwar hewce dike.

Êdî nivîskariya weke Ehmedê Xanî jî bes nake. Qraliya ku wî daxwaz dikir, carna ez dihizirim, dibêjim ev yek jî bes nake. Divê ji aliyekî ve em Memê, ji aliyekî ve jî Zînê biafrînin. Dem bi dem ez xwe wisa lê dikim. Weke din mirov nikare çareseriyê peyda bike. Afirandina bûyera Kurd, evîna Kurd, wêjeya Kurd misoger bi bersivandina van pirsan re pêwendîdar e. Niha mirov bi hêsanî nikare bibe wêjevan, çawa ku nikare bi hêsanî bibe şervan, bi hêsanî nikare bibe xwedî edebekî jî. Edeb bûyereke gelekî cidî ye. Ji bo afirandina edebê, divê em pêwendiya Kurd çareser bikin. Divê em jina Kurd, zilamê Kurd, egîdê Kurd çareser bikin.

## Serkeftina Evînê Serkeftina Gel e

Min ji berê de gotibû, ka çima bûyera Mem û Zîn ewqas zor pêş ketiye. Di wê derê de ezmûneyeke evînê heye. Hinek zorê li pîvanên feodal dike. Di bingeh de ev, bêriya şoreşa netewî-demokratîk e. Dibe ku di mîrên Cizîrê de bûyereke wisa qet derbas nebûbe. Lê Ehmedê Xanî yekîtiyê dixwaze. Tunebûna yekîtiyê di navbera feodal-mîrzadeyan de, va ji hikumdarên Ecem, Ereb nizanim Bîzansiyan re derfeta mêtîngerî û dagirkirinê dide. Di salên 1600'an de rewşa Kurdan a dewletbûnê û avakirina destpêkeke netewbûnê heye. Bi îhtîmaleke mezin feodal-mîrzade û mîr, li pêşiya vê yekê asteng in. Çareseriya vê dixwaze di wêjeya Mem û Zînê de nîşan bide. Naxwe kurekî mîr û keçeke mîr bi rihetî dikarin hev peyda bikin û bizewicin. Ev yek zor nîne. Jixwe di wan sedsalan de, bi tevahî zewacên di navbera mîran de wisan in. Hemû zewacên tebeqeyên jor, zewaca kurên mîr û keçên mîran in û tu zorî jî nîne. Di bingehê hev xurtkirinê de hê jî çêdikin. Li vê derê rewşeke derepîvan; li ser mîran, bi gor vê qonaxê ku yekitiyeke jor an jî bûyîna dewletekî re (em dikarin bibêjin bûyîna keyatiyek jî) nebûna xwesteka zordayînê ye. Va li pêşiya vê pêşketinê, ew mîr bi xwe asteng in. Ehmedê Xanî vê yekê pir eşkere dibîne û dixwaze bi destana Mem û Zînê vê yekê şênber bike.

Evîneke zor e. Çima evîneke zor e? Yekîtî pir zor e, dewletbûn pir zor e. Ji bo pêkanîna vê, pêwîst e ev evîn wê mîrîtiyê birûxîne û çepera feodal biçirîne. Ger ku pirtûk were xwendin dê were dîtin ku, daxwaziya yekîtiyekê heye. Divê gelek rêpîvanên kevin werin hilweşandin. Gelek fitne û fesad hene; ji bo rakirina van a ji rastê, hindek azadî pêwîst e. Hebûna van, tê wateya pêkanîna şoreşa netewî-

demokratîk. Ji ber ku şoreşa netewî-demokratîk peyda nîne, di Mem û Zînê de hevgirtineke serkeftî nayê pêkanîn. Yanî di ciyekî de tê wateya nepêkanîna yekîtiya bi serkeftî ango neyekbûyîna Kurdan.

Em jî, xwedî peywira pêkanîna bûyereke siyasî ya mezin in. Yekîtiya siyasî bûyereke mezin e û em dikarin ji vê re bibêjin evîna mezin. Da ku tevahî evînên piçûk karibin wateyekî biderbirînin, pêwîst e ev yekîtî pêk were. Xwe têxin şûna Mem û Zînê; ji bo ku hun evîna xwe pêk bînin, pêwîstiya yekîtiyeke siyasî û li hember serdestan pêdiviya rizgarkirina qadeke piçûk heye. Ji metirsiyê dûr bimînin. Di halê berevajî de rewşên mîna lêgerînên zayendiyê xiyanet e. ji ber ku dikeve bêviyaniyê. Da ku bikeve bêviyaniyê, nikare komê bi rê ve bibe. Ji ber ku nikare komê bi rê ve bibe, derbe dixwe. Dema ku derbe xwar, ev dibe tawana xiyanetê. Ez hizir dikim ku, yên vê disepînin jî hene. Viyana wî şikestiye û hedar (sebir) nekiriye. Tebî nikare sebir bike. Ji ber wê yekê evîn pir zor e.

Dîroka Kurd careka din bi teşeyekî (biçîm) jandar derdiket ser dikê. Ez hizirîm, ma gelo dîrokê xwe dubare dikir? Ez li ser gotinên Edûlê û ketina Derwêşê Evdî pir hizirîm. Divê ev çarenûs bihata guhertin. Min got, ji ber ku ewqas xwîna pakrewanan heye. Li derdora min mirov yek bi yek xwe dişewitînin. 1500 siwarî û gerîlayên me yên ku bi dilêrî şer dikin... Min got, xwedayo ev yek bi serê min de jî tê. Dema ku Quran tê xwendin çawa tê guhdarî kirin, vaye min jî wisa ev deng guhdar kir.

Min got, îman ev e. Di vir de kirûyên hunerî yên mezin hene. Bûyer ewqas bi hev ve girêdayî ne ku, tenê yên ku hene dikarin vê yekê fêm bikin. Welatparêziyeke mezin heye. Ev, dilêriya gerîla, ya îroyîn e.

Derwêşê Evdî gerîlayekî mezin e. Edûlê jî...

Jixwe gelek hevalên me yên stî (xatun) xwe dişewitînin. Di bingeh de ya Edûlê evîneke mezin e. Dibêje, "*fîlan paşe min dixwaze, lê ez tenê ji Derwêşê Evdî hez dikim. Ger ev jî nebe, ez a gora tarî me.*" Ev rêgezên hezkirinên Kurdan in. Egîdiya mezin e. Derwêşê Evdî ne radestê Tirkan û ne jî radestê Ereban dibe. Ev welatparêzî ye, serxwebûniya mezin e. Him evîna xwe dinase û him jî dijminê xwe.

Li ser vê yekê min ji hunermendê me Diyar re got, "*heke hun bi şerê mezin re nebin, a ku hun dikin sextekarî ye!*" Min jê re mînaka evîna mezin a Derwêşê Evdî nîşan da. Tu kes ne weke Edûlê, ne jî weke Derwêşê Evdî dikare bibe xwediyê evîneke mezin. Şerên wan jî mezin in. Vaye, destana Kurd, vaye evîna Kurd. Ma emê çima van ji bîr bikin?

Evîna Edûlê evîneke mezin e. Tu hunermend nikare weke ku Edûlê Derwêşê Evdî pênase dike, pênase bike. Ez nikarim ji wan kesên ku nikarin vê pênaseyê bi îro re girê bidin re bibêjim hunermend. Ez ên heyî înkar nakim, lê ez nikarim Edûlê jî înkar bikim. Ger Edûlê were înkarkirin, mezinahî û evîn pêk nayê. Ev gotinên mezin in. Giyana Kurdan e. Tu van ji bîr bikî û ji xwe re bibêjî ez hunermend im, hozan im, ezê ji te şerm bikim, nikarim te bipejirînim.

Gotin, newa (melodî) û bûyer ewqas di nav hev de ne ku, ez hizir nakim di tu gelên din de peydabin.

Evîna Kurd hetanî ku xwe neşewitîne nikare bi ser bixîne.

Vaye, di pêvajoyên dawî de sê keçên me xwe kirin bombe. Yek Bermal, yek Rojbîn û yek jî Binefş bû. Ev keç keçên evînê ne. Bi hezaran ciwanên Kurdan xwe wisa şewitandin.

Çima wisa dibe? Yek; evîna Kurd ji qurmê xwe ve, ji nû ve şîn dibe. Ya duyemîn jî ev hemû bi navê min pêk tên.

Niha ezê çi bikim? Divê ez bi serbixim ku careka din Edûlê û Derwêş, Mem û Zîn xwe wisa neşewitînin. Hemû destanên Kurd bi evînê dest pê dikin. Berxwedêriyeke mezin û piştre jî bêçareyî... Vaye, destan wisa diafirin. Di van destanan de yekîtî tune ye, şerê Kurdan bi serkeftinî nayê birêvebirin. Xiyanet heye û bêşensiya herî mezin jî dijmin hêzdar e.

Min got, divê ez serkeftina evînê biafirînim, -û ez diafirînim. Serkeftina evînê, serkeftina gel e. Hemû hewla min ji bo pêkanîna evîna Kurd e. Ez ne li dijî zewacê me, ger tu tiştekî bikî, divê tu bi evîn û hezkirinê çêbikî. Evîn gelê me ye û emê ji nû ve bidine afirandin.

Hinek Kurd hê ji niha ve li ser mirinê hindek lîstokan saz dikin. Heke Beko tunebana, me ji zû de serkeftin bi dest xistibû. Ji mirina min, a yekemîn dijmin, a duyemîn jî ev Beko berpirsiyar in. Ez li ser sewdaya Mem û Zînê, ji nû ve şîn bûm. Ez dijîm û xwedî tol im. Bila her kes hesabê xwe baş bike. Ez ji egîdiya xwe nagerim, hesabê dipirsim. Divê Kurd jî hinek tiştan fêm bikin. Beko'yên me pir in. Heke em fersendê nedin wan, em dikarin bi ewqas ked û xwîna

pakrewanan ve bibin xwediyê jiyana mezin. Zilamê Kurd di bin navê namûsê de nasnameya jinê girtiye. Min vê baş fêm kir. Dema ku keç dibe jin, nasname, ziman û xweşiktî ji dest diçe. Weke ku di destana Derwêşê Evdî de tê dîtin; Edûlê xwedî nasname, evîn û hêzê ye. Ji serê tilîkan hetanî mûyên porê xwe xweşikbûna xwe diparêze, -vaye evîn! Niha dema ku mirov van dibêje, dibêjin eyb e. Naxêr, ev Kurd e, binasname ye û em nikarin dev ji vê berdin. Jina bênasname nabe, jiyana bênasname nabe, egîdî nabe. Ev felsefeya Ehmedê Xanî û Derwêşê Evdî ye. Vaye, ji bo vê bi hezaran keçên me xwe şewitandin û gihîştin evînê.

Min bi stranekê dest bi vê xebatê kir. Niha hinek kesayet xebatên min nas nakin. Hunermendekî ku straneke baş diafirîne, li ba min ji sed fermandaran hêjatir e. Ez dizanim ka kîjan baştir e. Ev tiştekî weke sedî sed li hedefê xistin e. Dema ku min dest bi van xebatên xwe kir, min got beriya her tiştî divê ev dengê Kurd qut nebe. Ya duyemîn, min got divê keç wisa bi hêsanî ji dest dernekevin.

***Gihîştina şêwazên derbirîn, uslûb û hîtabên pergalên nû, têkiliyên nû,***
***her roj kevin xirakirin û şewitandin***
***û ji nû ve çêkirinê re rê vekirin***
***jiyaneke romanî ye''***

# Ji Pirsa "Çawa Bijîn'' re Bersiva Rast Roman e

Ya ku em dixwazin di vê sehayê de bidin pêşxistin, esas gelaleya (taslak) romaneke şoreşgerî ye. Em dikarin bibêjin ji pêvajoya qetandina korgirêka ku di civaka Kurd de hatiye çêkirin û pêvajoya ber bi rizgariya nû ve bi romanê hunandin ango bi romanê anîna ziman e. Bersiva em ji "Çawa Bijîn'' re bidin di wateyekê de dibe roman. Em raveya şoreşê ya bîrdozî, polîtîk û leşkerî û dîsa stratejî û taktîkê bi pêş dixin. Her wiha pêşketin çêdibin û diçin. Lê di heman demê de ger ku em pirsa "dê Jiyana şoreşger çawa be'' nebersivînin, wê demê emê şoreşa xwe, ji pêşketineke giyanî ya girîng û ji teşeyê libatê (davraniş) pêmen (yoksun) bikin û eşkere ye ku ev nabe saxlemiyek. Lewma ji bo milîtaneke şoreşger pirsa "Çawa Bijîn'' sotîner e. Jixwe têkoşîna rizgariya netew a ku di bin serokatiya partî ya me de pêş ketiye, xwe li hemû civakê alandiye, tenê ne ji bo milîtan, ji bo hemû takekesan şêwazeke jiyana şoreşger, ka çawa pêwîste bê peşxistin, bi qasî nan û avê bi misogerî aniye halê pêdiviyekê. Di nava civaka me de paşdemayînên mezintirîn û xirabûnên libatî hene. Dema têkiliya vê bi mêtîngerî, dagirkerî û dîsa bermayên çerxa navîn ve werin kolîn û dahûrandin, (çozumlemek) dê were dîtin ku ka çiqas têkilî û jiyanên werin hilweşandin û li hemberî wê bertek (tepkî) were raberkirin û dîsa di şûna wan de ji têkilî û teşeyên jiyana nû ku were afirandin, ewqas pêdivî pê heye.

Vaye roman, hindek jî di navbera vê duseriyê de hewldanê diderbirîne. Têkilî û teşeyê jiyana ku pêwîste were derbaskirin, têkilî û teşeyê jiyana pêwîste were parastin lêkolîn û lêpirsîn dike, didahûrîne û ji nû ve ava dike. Ev yek ger ku teknîka hunerê baş were karanîn, di wê rêjeyê (oran) de, wê ji şoreşê re tevkariya herî baş bide berpêşkirin. Tebî dema ku têkoşîna me ya şoreşger dibe mijara gotinê, rasteqînên dîrokî yên şoreşê, teşegirtina civaka ku xwe li ser radigire, bi taybetî li ba pêvajoya dîrokî ya nêzîk rasteqîna ku îroyîn dije û aliyên pêşketinên dibêtî (olasi) ku pêgirê nirxandina asteke nêzîkê zanistiyê were kirin û ji romanê re zemînekî wisa were berpêşkirin, em dikarin destnîşan bikin ku ev pêdiviya romanê pala xwe dide ango divê pala xwe bide ser binyada rasteqîna sosyalîst.

Ev yek di heman demê de, di bingehê daneyên (verî) zanîstî de derdikeve rastê, ew aliyên ku kevneperestî bi her awayî pê re çêdikin, şunda dikişînin û saz dikin û helwesta ku dixwaze nûjenî bike, ji her cure temsîla vê re, bi rexneyê ve dibersivîne. Li ba vê yekê, xwedî li rasteriya (gerçeklik) pêşketî derdikeve, ji bo pêşengtiya vê bêrî, (ozlem) azwerî (tutku) û bilindbûnê esas werdigire. Ev roman, rasteqîna tê jiyîn tam jî bi vê teşeyê digre dest. Esas jiyana takekes a ku bi hilweşandinê ve rûbirû maye û piştgiriyê ji jêr û jorsaziya civakê werdigire, ji hilweşandina wê re çavdêrî dike û bi şêweyê herî radîkal rexne dike. Lê di heman demê de, ya ku cihê wê de were cîbicîkirin, ka dê çawa be, hewl dide ku vê yekê jî derbixîne rastê û girêdana bi kevirên bingehîn ên jêr û jorsaziya tevahî jiyana nû, ya ku divê were pejirandin, bide avakirin. Ev, di kesayeta tîpekî yan jî çend tîpan de dikare ji

avakirina nû ya hemû civakê re, rê bide vekirin. Li vir sê-çar tîpên ku werin bi destgirtin, di heman demê de ji dahûrandina rasteqîna dîrokî û civakî re, dê rê bide vekirin. Çend tîpên ku, ka ji kîjan dîroka paşdemayî têkiliyên civakî yên vê dîrokê temsîl dikin baş dadihûrîne, baş çavdêrî dike, baş rexne dike û ji nû ve ava dike. Ger ku vê yekê çiqas bi kûrahî, bi xweşikî û bi hunerî bigre dest, ewqas jî dikare berhemên hunerî yên saxlem derxîne rastê. Êdî ev der, bi hêza hunermend ve girêdayî ye. Hindek xeyalên xwe dide axaftin. Yanî di vir de ji zanistiyê zêdetir, xeyal dayina axaftin, û anîna ziman a xwestek, bêrî û azweriyan mijara gotinê ye. Ez li hember çi me, çi dixwazim, divê çi hilweşînim, çi ava bikim; çi kirêt e, çi xweşik e; çi nayê jiyîn, çi tê jiyîn; çi tê pejirandin, çi tê redkirin; çi tercîha min e, çi ne tercîha min e, van pirsan eşkere dipirse û bersivên tûj dide. Bersivên ku bide, dê giştiya civakê girê bide.

Vaye, ew gelaleya romana ku em dixwazin pêş bixin, divê kêm zêde li derdora van pirsan were derxistin. Rasteqîna tê jiyîn jî di wateyekê de ev e. Li gel pêwendiya vê rasteqînê bi mezintirîn kevneperest û muhafazakar, yanî bi mêtîngeriyê û bi bermayên feodal ve, di heman demê de, ew civaka ka çawa bi nûjeniyeke sexte ve tê cîlakirin, hewl hatiye dayîn ku derxîne rastê. Heta welatparêziya sexte, di bin navê çepê sexte de, kesayet û kesayetiyên heyî ka çi ne, hatiye ravekirin û li gel van, pêwendiya rizgariya civakî ya nû bi nasnameya netew re ango di asta kesanî de temsîlkirin ka wê çawa çêbibe; kesayetên wisa çawa derdikevin rastê û çawa ditêkoşin. Ev yek jî hatiye eşkerekirin.

Yek jî, qala tîpên berwenda (orta yolcu) hatiye kirin. Ew tîpên ku lingekî xwe li bermaya serdema navîn e û lingekî xwe di nava şekilbûyîna civaka nû de ye. Ev her tim şîkeştinên her du aliyan jî temsîl dikin û xwe li dijî her qonaxên girîng didin peyitandin (ispatlama). Ev helwesta wan jî hatiye rexnekirin. Bi taybetî dahûrînên Serokatî (em dikarin bibêjin dahûrînên bingehîn in) pêşketinên ku di vê mijarê de derxistine rastê, ger werin lêkolînkirin û pê ve girêdayî ger ku weke kelûmelên (malzeme) romaneke şoreşger werin nirxandinê dê tevkariyeke rast berpêş bike. Ev xet kêm zêde di dahûrînan de hatiye eşkerekirin. Dahûrînên kesayeta bingehîn; di jiyanê de, di nava şerê germ de hatine ezmûnekirin û derketine rastê. Yanî ev ne xeyalî ne, rastînên ku şoreşê derxistine rastê ne.

Lewma dane (verî) û kelûmelên ku romaneke rasteqînî pala xwe bidinê ye. Yanî kelûmelên ku di wêjeya tu welatî de nehatine peydakirin, bi dest ketine. Têkoşîna rizgariya netew ku di bin serokatiya PKKê de hatiye birêvebirin qehremantî, xiyanet û berwendayên ku derxistine rastê kelûmelên mezintirîn in ku mirov dikare bike mijara hemû şêweyên pirtûkan. Ev rastî hemû tîpan di hundirê xwe de radigre. Em hewl didin ku tenê derbirîna vê ya herî giştî, girêdayê bi pêvajoyên rizgariya netew û partiyê ve bidin. Gelaleya romanê dixwaze him di aliyekê de rasteqîna mêtîngerî û faşîzma tirk, di aliyekê de jî rasteqîna Kurdistanê ya eşirî û feodaliya serdema navîn, di aliyekê din de jî, rewşa kedkar, karker û gundiyên xizan bîne ser ziman. Her wiha dixwaze, ew kesên ku têkiliyên eşîrî û feodalî hatine qutkirin û hatine şekilkirin jî bîne ziman. Û PKK di

wateyekê de dibe ev. Roman, hewl dide ku pêşketina di vê wateyê de bi asta hunerî pêş bixe. Hem berhemeke pêşketina şoreşî ye, hem jî ji bo pêşketina şoreşgerî teşeyekê dide. Her çendî ku bi helbest, mûzîk û wêneyan şoreş pêk nayên jî, ji bo pêşxistina herî cewherî ku dê roman jê re tevkariyekê berpêş bike bêguman e. Gelaleyê kêm zêde rengdayîna vê ya naverokê jî ji xwe re kiriye armanc.

Di bingeh de tîpên hîmî mijara gotinê ne, lê heke ku em gelek tîpan bidin axaftin dê kelûmel bêtir dewlemend bibin. Lewma bi neqandin (bijartin), yekirina gelek qismên baş, yanî bi gihandina sentezekê roman dikare pêk were. Di vê gelaleya romana ku em dixwazin bidin de, bi komên curbecur re lêgerîn tên çêkirin. Em li hember kîjan jiyanê bertek (tepkî) raber dikin û ka em bêriya kîjan jiyanê dikin, tê lêpirsîn. Dîsa çi baş e, çi xweşik e; çi rast e, çi çewt e; çi kirêt e, çi xirab e pirsên wiha di vir de zêde tên pêşxistin. Ji ber ku roman hindek di nava van têgînên hîmî de pêş dikeve. Hun, ji ku derê tên, jiyana kevin çi ye, jê qutbûna we çawa ye; dîsa pêwendiyên we bi jiyana nû re çi ne, hun çawa pê ve hatin girêdan, hun dixwazin çawa pêş bixin, van pirsan zêde pêş dixîne. Di aliyê din de bi lez pêşneketin û nehatina halê milîtaneke şoreşger, ka çi diderbirîne; xuyangên vê yên curbecur çi ne; di kesayetê de rê li ber çi vedike? Ev tên lêpirsîn û bi azîneyeke (yontem) rast ji bo pêşxistina şoreşê bi her awayî daxwaziya tevkariyê tê kirin.

# Divê Romana Kurdistanê Xweser Be

Bêguman gava ku li Kurdistanê gelaleya romana şoreşger tê pêşxistin, ji ezmûneyên netewên din jî sûdwergirtin girîng e. Bi taybetî rasteqîna romana Fransa ku şoreşên hîmî çêkirine, dîsa rasteqîna romana Rus û heta li gel hindek taybetmendiyên qonaxa zayîna şoreşa Îslamê, Vîktor Hugo, Balzaq û hwd. romanivîsên mezin hene. Pêwendiyên van bi şoreşa Fransa ve tên avakirin. Dîsa şoreşa Rus têkiliyên xwe bi Tolstoy, Dostoyevskî, Çernîşevskî, Gorkî û hwd. re çi ne; van di kîjan qonaxa şoreşê de û bi çi cureyê berheman, di tevkariya şoreşê de peyda bûne? Hindek taybetmendiyên bingehîn ên şoreşa Îslamiyetê çi ne; bi taybetî çima piştre bûye paşverû, vegeriyaye kevnepêrestiyê û hindek taybetmendiyên bingehîn ên kesayetiyê çawa derxistine rastê? Malbateke çawa, tîpekê jin-zilamê çawa derxistiye rastê.

Di rasteqîna civaka Rojhilatanavîn de, mirov dikare van li pêş çavan bigre. Bêguman divê romana Kurdistan, ku xwedî rasteqîneke şênber a bêşiban e, bîne pêş çavên xwe. Ji ber dîroka jiyaye, taybetmendiyên civaka Kurd, pir hindik dişibin civakên din. Lewma pêwîste reseniya (orjinalî) xwe pir baş bîne pêş çavên xwe. Yanî romana Kurdistan, pêwîste bibe romaneke xweser, nikare pir zêde bi asayî (normal) pêş bixe. Asayîkirina romanivîsiya Tirk jî zêde pêşxistinêr nîne.

Têkoşîna şoraşa me ev yek pir bi rengekî balkêş daxistiye rastê. Xebateke hunerê ya kûr, dikare pir baş bibîne ku

şoreşa me ya pêşketî hinaseyeke mezin daye hunerê û bi hunerê jî pir baş şoreş tê pêşxistin. Dikare hêzê raberî xebateke wisa bike û berhemên xurt derxîne rastê. Di vê û hemû qonaxên tekoşîna me de ji pirsa "çawa bijîn" re gihandin û peydakirina bersiveke rast, ne karekî biçûk û ji rêzê ye. Ger derfetên me dest dabana, li gel peywirên bîrdozî, siyasî, leşkerî, me dê karîba tevkariyeke wisa ji peywirên wêjeyî re berpêş bikira. Jixwe her ku em firsendê dibînin, em hewl didin ku vê pêk bînin. Bi rastî jî ev hewldanên me tevkariyê diderbirînin.

Milîtanên ku di vê mijarê de ji xwe bawer in, divê ji ber çawanî pêşwazîkirina hunerê û bi taybetî jî wêje û romanê ve xwe berpirsyar bibînin. Lewra divê peydakirina bersiva pirsa "Çawa Bijîn'' jî ji bîr ve nekin û bi vî rengî ve bikaribin hevkariyeke baş raber bikin.

Çawa ku ez pir caran diyar dikim, mirov dikare gelek mînakan bîne pêş çavên xwe. Di dîroka her gelî de pêngavên weke vê hene. Di qonaxa began a xweseriyê (ozgun( de, hindek pêşketin di wêjeya kurd de çêbûne. Mirov dikare di hindek destanan de qonaxên dîroka Kurd a xwedî jêderka çiyayên tên zanîn û nayên zanîn bibîne.

Hindek tîpên weke Kawayê Şoreşger ku serî hildane û vegotinên wêjeyî yên weke Memê Alan hene. Van ji sertara (lutke, ser) girîng a pêşketina civakî hêz girtine û hatine pêşxistin. Bi vegotineke lehçeya Rojhilat an jî bi azîneyan heta roja me ya îro bandordar bûne. Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî di vê wateyê de, bi taybetî di qonaxa ku otorîteya keyayan (qeyser) ji bo gelan çarçoveya netew û civakan xet dikir de, bilêvkirina pêdiviya yekîtiyê ye. Hewl dide ku

şêwaza mîran a parçekar û pevçûnêr a ku yekîtiya netew pêk nedianîn û xwiyanga nav sûlaleya feodal vebibêje. Vebêja di vir de pêk tê, esas rasteqîna feodal -mîr a req ku nayê yekîtiya gel û wê yekîtiyê venaguhêze asta netew e. Pir û pir fitne fesad hene, xulamtî hene; hewl dide ku vê bîne ziman. Lê, ji ber ku pêvajoyeke şoreşî ya bingehîn nejiyaye, nikare bi vegotineke xurtir xwe temam bike û pêş bixîne.

Ji ber ku Kurdistanê şoreşeke cidî nejiyaye, em di dîrokê de, ne di sedsala 18'an, ne di sedsala 19'an, ne jî di sedsala 20'an de rastê mînakên romanên xurt nabin. Ên hatine nivîsandin, di bingehê tunekirina serdestiyê de romanên netewên serdest in. Di vê mijarê de Yaşar Kemal bi xwe jî, navê wê rasteqînê ye ku ji rasteqîna Kurd a ku bûye Tirkane best girtiye û derketiye rê. Xwedî romanivîsiyeke wisa ye. Mîna vê gelek romanivîs hene. Ev ew romanivîs in ku di dirêjahiya tevahî dîroka komarê de, ew rastiya ku serhildanan perçiqandiye û piştre jî, bi Tirkiyê re kiriye yek di teşeyeke pêşverû de pênasekirin e. Di ciyekî de hatiye xwestin ku serdestî, sinc (exlaq), wêrankarî û tunekirinê bi riya wêjeyê re rewa were nîşandan. Di vê bingehê de pergala ku hatiye avakirin; mîna xweşiktiya pêşverû ya ku pêwîst e were jiyîn sepandiye (dayatma). Ji lewra bi wêjeyê hatine aşîkirin. Perspektîfa van romanan, dil neşewitandina bi rasteqîna Kurdistanê û tênegihandina hebûna wê ye. Bi lezgînî her tişt înkarkirine! Dîsa neyêniyên kevin venekirine. Kurd, weke mirovên paşverû û hov nîşan dane.

Vaye, dixwaze bila Kurd be, dixwaze bila Tirk be, heya niha di derbarê Kurdistanê de romanivîsî, hunermendî û wêjevaniya baş a li ser vê esasê xwedî erkekê (rol) ye.

Bêguman vê romanivîsiyê di radeyeke dawî de wêrankarî afirandiye. Bi taybetî şekilgirtina kesayetê çelexwarî pêş xistiye. Ramîna azad û rasteqînî asteng kiriye. Tirkbûyînê, koçberiya metropolan, biçukdîtina welat û gelê xwe, bi rengekî hêsanî dest jê berdan bi xwe re aniye. Ev ji pêvajoya herikîna ber bi metropol û Ewrûpayê mezintirîn, pêvajoya ji xwe revê ye. Di heman demê de pêvajoya revê ya ji giyan û mejiyê xwe ye. Heta ev pêvajo, qasî xwe înkariyê bi pêş ketiye. Pir hindik kesan karîbûne li rastiya xwe xwedî derbikevin. Her tişt bi erzanî ji dest hatiye derxistin. Yên ku nav girtine ser zimanê xwe jî, ya hatine sîxurkirin an jî, hevkarmendên bi misyona ku di bingehê hin berjewendiyan de bi dest girtine de derketine rastê. Welatparêzî, veguhertine têgîneke ku di ber re jî nayê borandin.

Em vê yekê heta derketina tevgera şoreşgerî, bi rengekî jandartir û kûrtir dibînin. Bi taybetî binketina serhildana, di derhatina encameke wiha de rol leyistiye. Piştî serhildanan, yanî qonaxa terora spî, esas rastiya gelê Kurd, ji qonaxa serhildanan zêdetir xistiye xeternakiyê û em dikarin bibêjin ku aniye heta xala ber qedanê.

Vaye, ev tîpên heyî, di çarçoveya vê vegotina giştî de derketin rastê. Em, hinek wisa derketin holê. Hun weke derbirîna vê gelemperiyê, dikarin pênaseyekê deynin ka hun çi ne û dixwazin çi bikin. Di wateyekê de ev, êdî dibe gihîştina kesan a pêvajoya nirxandina rasteqînî.

Yên ku rast ji rasteqîna xwe fêm nakin, qet nikarin bibin xwedî çalakiyeke cidî. Bi aliyên xwe yên zêde hestiyar ve derdikevine rastê û ev derketina rastê jî, ji her cure bandorê re vekiriye. Çima ? Ji ber ku ne derketineke li gor pênaseya

rasteqînê ye. Ji xwe bêhay e. Em jî di vê wateyê de, jê re dibêjin şûngeha "Xafîl.'' Mirov dikare ji vê re bibêje şêweyeke cehaletê jî. Ger hun bala xwe bidinê, ev, rasteqîna we tevan a ku bi giranî hun dijîn e. Hun tev xwedî jêderkeke wiha ne. Zanebûn û hesta vê jêderkê (çavkanî) di we de çiqas bi pêş ketiye, diyar nîne. Kemalîzm bi qasî karibe ketiye nava, malbat û eşîrê, qasî ku karibin ketine nav. Ji têgîna (kavram) welat û ji têgîna gel heta dawiyê pêmenî hatiye jiyandin. Taybetmendiyên rewşenbîrên Tirk di radeyeke dawî de bi awayê demagojîk reng daye. Dîsa demagojiya feodal rengê xwe daye. Bîrdoziya dê, bav û kalan rengê xwe daye. Van tevan kesayet ji rasteqîna bingehîn, ji rasteqîna dîrokî, ji rasteqîna hemdemî dûr xistiye û jê qut kiriye. Lewma hun lewaz dimînin. Hûn, di bîrdoziyê de, di polîtîkayê de, di çalakiyê de û di jiyanê de lewaz dimînin. Di her sehayê de koma tîpên ku dinalin, diqarin, ditengisin, net nabin, tûj nabin, nayên dahûrandin û xwe nagihînin çareseriyê, mijara gotinê ye. Taybetmendiyên vê kesayetê, xwe xistiye hundirê pêşengiya şoreşî. Me, hewl da ku, em vê yekê bi şurê şoreşê yê herî tuj derbas bikin. Piraniya we di vê bingehê de herikîn nava şoreşê. We got, "Ev rêka herî kurt a pêşketinê ye.'' Li hember pergalê berteka (tepkî) we çêbû, hun hatin nava şoreşê. Helbet tiştên we di nava partiyê de jiyaye, ew hezar teşeyên kevin bi şêwazeke cuda berdewamkirin e. Li hember vê bertek, di ciyekî de şerê nava rêkxistinê yê şoreş û dijî-şoreşê ye. Her wiha di vê pêvajoyê de derketina yên binkeftî û serkeftî, di kesayetên we de weke van pêşketinan şênber tên jiyîn.

Ger were dîqetkirin, em dixwazin gelaleya romanê bi tevlîbûna takekesan a nava pêvajoya şoreşê, nava pêvajoya partîbûyînê, nava şiyarbûna netew û pêvajoya azadbûyîna civakê bidin destpêkirin. Romana şoreşger bi wateyekê, peywirdar e ku derketinê wisa çêbike. Lê belê, ew lewazî, qelsî û xumamiyên nayên bawerkirin ên di destpêkê de ku me pê dest bi kar kir, nayên paşçavkirin. Ji ber ku rastî eşkere dike ev yek wisa ye. Mirov bi demagojî û bi gotineke, “Ez pir xurt im, pir bi biryar im’’ nikare derbas bike. Bi rastî jî niha em baştir têdigihîjin ku, hestên sexte û pêşandanên wêrekiyê zêde wate naderbirînin. Em dibînin ku ketina nava her cure têkilî û nakokî ne cidî ne û encam nagrin. Em destnîşan dikin ku qasî kesayetiyên pir nepixandî, kesayetiyên pir mirî jî, ne xwedî asta dema derketina şoreşê ne. Lê, li rexmî hemû hewldanan, ji ber ku derketina şoreşgerî pêwendiya xwe bi çalakî û tempoya şênberiya PKKê ve neda avakirin, çelexwariya pêşketinan bi rêbazên zehmet hate zelalkirin.

Tîpê me, ji hemû taybetmendiyên xwedî nêvengên wiha re vekiriye.

Gava ku me hewl da tîpekî wisa bixin nava gelaleya romanê, bi qasî zelalkirina aliyê zanîstiyê, pêşxistina aliyê wî yê hunerî jî me pêşçav kir û bi vî awayî me xwest nêzîkatiyeke wiha pêş bixin. Niha em vê yekê gotûbêj dikin. Bi wateyekê roman tê pêş xistin. Bi gotineke rastir, êdî pêşketinên di nava jiyanê de ber bi nivîsandinê ve diçin. Ew pirsên timî me dipirsîn, pirsên romanî ne. Çawa çêbikin? Çawa bijîn? Ev pirs, pirsên herî zêde tê pirsîn in; tesadûf nîne. Hema her roj têkiliya bi livgeriyê re heye. Ev,

vesazîkirina nû diderbirîne û ziraviya kar dadixîne rastê. Bi taybetî di aliyên hin têkilî û libatan (davraniş) de raberkirina bertekan, redkirina arezû û xwestekên şêwaza kevin, li şuna wan danîna xwestek û viyana şêwaza nû û bi kevneşopiya civakê re, di asta damezraka malbatê de ketina nava têkoşînê peyda ye. Ji hemû aliyan ve çawaniya rasteqîna malbat, eşîr û babistînê (soy) eşkerekirin, bandora wan a li ser jiyanê dîtin û bi wan re şerkirin; dîsa gihîştina pergalên nû, şêwaza derbirîna têkilîyên nû, hîtap û uslûba wan, her roj kevin şewitandin-rûxandin û ber bi avakirina nû ve rê wergirtin, jiyaneke romanî ye û ev bi çalak e. Em dibînin ku di kevneşopiya romanê de babetên herî zêde tên karanîn, asta hestan e. Asta zanebûnê bêtir bi derbirînên zanistiyê ve tên nirxandin. Bêguman roman asta zanebûnê tevlî naveroka xwe dike. Lê bi giranî dixwaze asta hestan û şêwaza derbirîna giyanê bigre dest.

***Bêguman ji derve çavdêrek dikare romanekê binivisîne, lê em dikarin bibêjin ku romana herî baş rasteqîna tekoşîna Kurd dê ji milîtanên ku rasteqînê bi germî dijin were pê.***

# Romana Şoreşgeriya Kurd Rasteqînêr e

Pêşketina civakî, li ser bingehê rexnekirina rastiya civakê ya ku bi her awayî pêwîste kesayetiya wê were destjêberdan, xwe dide axaftin û derdikeve holê. Bi vî awayî di bîçima jiyana ku yekgirtina têkiliyên civakî yên kesayet pejirandiye dide axaftin, û bi vî awayî rastiyeke guhêrkar û dahûrîner derdixîne holê.

Di şekilgirtinên netewî de, demên veguherînên çînî, dibin demên şoreşî. Ji bo pêkanîna her şarezayiya civakê, şoreşa ku tê wateya serûbinbûyîna bingehîn, di destpêkê de di warê zanistiyê de bi pêş dikeve. Pêşketina zanistî, li gel rêkxistin û çalakmendiyê; felişandina têkiliyên jorsaziyê ku êdî li pêşiya jiyanê asteng in jî ji xwe re mîna peywirekî girîng datîne pêşiya xwe. Bêguman tevgera şoreşger hewldanên xwe yên ramyarî, li dijî raman û bîrdoziyên kevin, di rêjeya (oran) têkoşînvedana rehdar (damar) de, naverok û xeta xwe ya bîrdozî derdixe rastê. Dîsa vê têkoşînvedana xwe gava ku li hember dezgehên jorsaziyê dike hewldaneke pratîk, êdî di nava sînorên zagonan da cîbicî nabe. Nikare bi azînên zagonî û aştiyane qîma xwe bîne. Bi azînên dijwarî dixwaze rastiya siyasî vebike û ji lewra pêşketina siyasî pêwîst dibîne. Her wiha pêşketina şoreşgeran destpêkê di warê bîrdozî û her wiha di warê siyasî de derdikeve rastê. Şîdeta şoreşê, di rêjeya sepandina rêxistin û çalakiyê de, têkoşînê ber bi warê leşkerî ve dişemitîne. Her wiha pêşketina şoreşê ya bîrdozî û polîtîk berdewam dike û diçe. Ger xwe bigihîne serkeftinê wê gavê jêrsaziya xwe vediguherîne û şêweyê

hilberîna (uretim) kevin dirûxîne. Ew têkiliyên ku astengî çêdikin belav dike. Têkiliyên mulkiyeta nû di destpêkê de di çarçoveya dest didin de ji bo pêşketina hêzên hilberînê ava dike û hewl dide ku pêşketina xwe temam bike.

Ev tekoşîn di heman demê de şerê hestan e. Hezkirin dikeve hundirê vê, weke îfadeya kûr evîn dikevê; wekî din nîşanên kerbê û heta xiyanetê tên vegotin. Dîsa têginên kirêtî û xweşiktî dikevin dewrê. Tîpên berwenda û qehreman tên pêşxistin. Ev tev hinek jî bi razberkirinê (soyutlama) ve tên çêkirin. Yanî di bingehê çavderiyê de şûna yek bi yek kesayet werin vegotin, kêm zêde hemû kesên ku tevlî pêvajoyê bûne taybetmendiyên wan ên hevbeş di romanê de tên vekirin. Ev razberkirinek e. Ji şênberiyê (somut) razberkirin, ji asta razberkirinê jî tim û tim daxistina takekesan û pêşketina dema pêş bi çavderiyê sepandin, dibe teknîka romanê. Her wiha hinek hêman di hinek qonaxan de bi kûrahî tên vekolîn. Ku qonax baş neyên vekolîn, hêman jî baş nayên vekolîn. Heta hinek aliyên hêmanan, di hinek qonaxan de zêde tên vekolîn. Di hinek qonaxan de ji wan berhem namînin. Yek jî têkilhev tên vekolandin. Yanî vekolînek tenê bi serê xwe ne pêşketina hestan e. Bandor û bertek di nava hev de ye. Rik, hezkirin; xafil, şiyar; şoreşger, dij-şoreşger di nava hev de ne. Dîsa tîpên bintûte (sîlîk) û tîpên balkêş ku li hember wî derdikeve, di rewşa pevçûnê de ne. Carna ev pevçûn gur dibin, carna jî gihanekê (baglaç) pêk tînin û ber bi çareseriyê ve diçin. Carna jî dixetime û dikeve nava qeyranê. Yek jî tê veguhertin. Heman veguherînê dijî. Dema ku vediguhere, carna tê qezenckirin,

carna jî tê wendakirin. Carna tê derbaskirin, carna jî tê pîrozkirin. Weke ku têkilî û nakokî ji têkilheviyeke wisa difilitin, ber bi pergal û asteke pêşketîtir ve diçin, carna jî dikevin nava xeniqandinekê û dimirin jî. Pêwîste Roman, di bingehê vê teqalê (duzlem) de bigihê îfadeyekê.

Bi taybetî, di gelaleyê de mînak, min ji xwe da destpêkirin. Li ba vê yekê em kesên din jî didin axaftin. Wisa tê fêmkirin ku emê gelek kesan bidin axaftin. Her kesê ku diaxive, di kesayeta xwe de gelek rasteqînan tîne ziman; qasî aliyên bingehîn, aliyên talî jî datîne rastê. Qasî aliyên ku giştî bi xwe ve girê didin, aliyên eksantrîk jî hene. Lê bi sentezkirineke ku piştî van tevan were çêkirin, em dikarin romanê şênber bikin.

Jixwe di romanan de bi giştî kes, viyan, hest û azwerî diaxivin. Ger ku em jî, bi vê wateyê takekesan bidin axaftin (bi taybetî ku ev hindik zêde giştîbûyînekî tînin ziman) ev azîneyeke rast e. Di vir de ya girîng ew e ku veqetandina tiştên bingehîn û talî were çêkirin, ên bingehîn ên civakî-netewî û heta mirovanî werin dîtin, di nava hurdeyan de neyê xeniqandin û yên zêde ne balkêş in, asta xwe ya temsîliyê nînin, di nav re neyên dagirtin.

Bêguman hêza ziman û uslûp jî pir girîng e. Jixwe rola hunerê di vir de ye. Ev war, wareke ku pir afirandêrî dixwaze. Jiyana wê jî, hindek hunermendane ye. Vegotina wê jî, bêguman dê wê temam bike. Gelaleya were pêşxistin jî, dê di vê çarçoveyê de be. Dema ku em, hinek tîpan di nava vê çarçoveyê de didin rûniştandin, em carna yên ji zindanê derketine jî didin axaftin. Ji ber ku yên ji zindanê derketine, xwedî hinek rasteqînên jiyanê ne. Ger ku

rasteqîna dijwar a zindanê neyê dahûrandin, hemû hest û asta jiyana wan bi tevahî aliyên xwe ve neyên ser ziman, roman nayê temamkirin, dê kêm bimîne. Her wiha dana axaftina yên ji zindanê derketine, pêwîste were domandin. Qasî gelek aliyên wan ên erênî, aliyên xeternak û rizî jî hene. Ji van hinek tîp bi cinewirî, hinek tîp jî bi qehremanî derketin; zelalkirin û dîtina vê pêwîst e. Yên ku li ser navê hest û azweriyan pergalê bi rengekê herî pûç dijîn û pergalê dihebînin hene. Hem jî ew kesên ku vê bi rûpoşa (maske) şoreşgerî dikin, me dît ku ne hindik in. Wêjeyeke sexte ya zindanê, bêriya pergalê, hate xwestin ku li ser navê bêriya şoreşî daxînin rastê. Heta nepixandin û demagojî pir zêde ye. Ji ber ku jiyana pratîk û şênber nîne. Bi vî awayî zemînê sextetiyê zêdetir xurt dibe. Pêwîste rexneya vê were çêkirin û hê jî em li ser vê disekinin.

Bi kurtasî, tengasiyên negihîştina jiyana nû û teşeyên têkiliyan tên jiyandin. Roman di vê wateyê de bêtir dikare ber bi şênberiyê ve biçe û hewl dide di ciyê civakî de derkeve pêş. Roman hindek jî ev e.

Ya eşkere ew e ku malbat û jina dîl perçe dike; û dîsa hevkariyê belav dike. Têkiliyên jin-zilam ên di nava malbatê de belav dike û rûpoşa wan dixîne. Kî çi ye, çawa ye; derdixe rastê. Ji pirsên “Çawa bibe’’ ango “Çawa bijîn’’ re bersivan digihîne. Bi vî awayî ev jiyan, bi rastî jî tam dibe kelûmelê romanekê.

Jiyanê kêm zêde ev yek anî ser ziman û rengê xwe da gelaleya romanê. Tebî hinek babet hene divê zêdetir werin

pêşxistin. Tenê yên jiyandî anîna ziman, dê bibin bîranîn, ji ber ku roman vê kategoriyê derbas dike. Roman, hindek a ku dest bi vejandinê kiriye bi avakirina hindek xeyal û hêza gelaleyê vedike û ber bi çawa bibe ve dibe. Dikare bi geşî pêş bikeve û dikare bibe dara azadiyê ya baş. Lê dibe ku aliyê çelexwarî jî bikeve. Di vir de erkdariya romanê heye; dikare asteke tam azad a pêşketî bigre; dikare bi rengê dara azadiyê, şêwaza jiyana azad bibe bandordar. Dar, bi awayeke din jî şîn dibe, zîl dide û mezin dibe, lê ku neyê xwedîkirin dê roman çelexwarî pêş bikeve, nikare zêde bilind bibe. Dîsa dê ji her cure xeternakiyan re vekirî be; dê bibe pêşketineke pûç ku xwe negihandiye hestî û goşt. Zêde estetîka vê pekhateyê nîne, lewma dikare birûxe. Roman, dikare vê yekê hindekî asteng bike.

Roman, di derbarê diviya çawa bibe de xeyal û gelaleya xwe dixe dewrê. Îdealîzm, xîret û azweriyan tîne ziman. Baş e, bi tevahî ev e, yan na? Naxêr! Zîldayîna rastînekê heye; heya ku ev zîldayîn neyê dîtin, nivîsandina romaneke rasteqînî gengaz nîne. Di hundirê civakê de zêde şensê nûbûyînê nabîne, nikare derbirîna yê ku hatiye qedandin bike. Roman tam pevbestînek (kurgu) û gelaleyek nîne. Rewşa zîldayina rasteqînê bi hewldaneke mezin, bi hêza gelale û bi hêza xeyalê anîna ziman e. Di bingeh de bi cureyek çalakmendiya cuda, tê wateya temamkirina jiyandina li ciyekî. Ji ber ku ya tê jiyîn bi kiryarî jî, hindek ev e. Yanî li gor zanistiyê, li gor çîrokê hin tişt hatine jiyîn, lê gelale û xeyal jî hene. Yên nehatine pêkînandin, ên hatine çelexwarîkirin û dîsa yên ku saxlem pêş ketine hene. Vaye, roman dê van bîne ziman.

Bêguman em ji vê re dibêjin hunereke estetîk jî. Tevahî erkdariya hunerê ev e. Jiyanê estetîzekirin, bêtirîn xweşikirin peywira hunerê ye. Tê wê wateyê ku dê roman jî bibe xwedî erkdariyeke wisa. Tebî di vir de yên tên pejirandin, ên nayên pejirandin û yên tên redkirin, yên nayên redkirin hene. Yanî wergira (kapsam) wê pir berfireh e; em ji avakirina pêwendiya bi welatparêziyê re bigrin, heta destgirtina taybetmendiyên baş ên şervanên rêxistinê, wergir û fireh e.

Romaneke şoreşger, kesekî statûkoperest qet nikare binivîsîne, nikare di nava bîra xwe de bihewîne. Dîsa yê ku hemû asta partiyê nedîtibe, nejiyabe nikare zêde xwedî îdîa be. Ji derve çavdêrek bêguman dikare romanekê binivisîne, lê em dikarin bibêjin ku romana herî baş dê ji milîtanên ku rasteqînê bi germiyê ve dijîn were pê. Romana rasteqînî, ji nava hewldanên milîtanê şoreşger derxistin guncaw (uygun) e. Romana rasteqînî, hin kes dikarin di vê kategoriyê de binivisînin. Di vê mijarê de hin tîpên ku em dibêjin hunermend, bêguman ji derve ve jî, bi çavdêriyekê dikarin binivisînin.

Jiyîn...

Rasteqîna civakî, mirovên ku hindek xwedî hiş in qet nade jiyîn. Tu rasteqînên civakî bi qasî ya me takekesê naperçiqînin, di nava êşan de nahêlin û di nava nabosên mezin de nadine girtin. Vaye, em izdirab û tenêtiya vê ya mezin dijîn.

A ku ez dikim, ji rizîbûnê wêdetir, di bingeh de qêrîna wê civak û wî takekesî ye, ku îdîaya xwe wenda kirine; viyana xwe him fermî û him jî bi kiryarî veder kirine û di nava êş û tenêtiya mezin de ne.

Di bingeh de li hember civakê ev rasteqîna serhildanê ye.

Di rasteqîniya me de ji bo takekes her tişt ewqas neyinî ye ku, mirov nikare qala çi mafê takekesî bike. Ev tam jî karê wêje û rewşenbîran e. Zanist civakan vedikole, dîroka wê dîroknas vedikolin, siyaseta wê siyasetmedar û zanistiyên siyasî vedikolin. Lê takekes bi xwe jî ji hêla wêjeyê ve tê vekolandin. Lê mixabin, di nava me de nehatiye lêkolînkirin; êş û dilşadî nehatine nirxandin û takekes di hundirê tenêtiyeke nayê bawerkirin, her wiha bêşiyarbûnî, bêbawerî, bêewleyî, tirs, endîşe û bêhêviyê de ye, ji her aliyê ve hêza jiyînê wenda kiriye û dişibe çivîkeke ku per û baskên wê hatine şikênandin û ne diyar e ka dê bi ku derê ve biterike.

A ku ez dikim, hindek perpitandina vê ye, ger hindek gengaz be bibaskbûn û gengaz be derbasbûna firînê ye.

Rewşenbîrên me yên ku xwe sipartine rastîna civakê nînin.

Her ku ji rasteqîna civakî dûr dibin, ber bi zemînê netewa serdest ve dişemitin û wisa rewşengerî pêk tê. Ji bo bûyîna rewşenbîrî, behremendiya (kabiliyet) şoreşgerî ya rastîn pêwîst dike.

Ger ji hemû aliyan ve bi rasteqîna civak, gel û pergala civaka xwe tê bigihîje, ev yek bi xwe re pêwîst dike ku pergala zilma pir giran bibîne, vebikole û hilbikole. Ev jî têr nake, ji ber ku bi hemû aliyan ve dan û standina henase girtina civakê asteng dike, divê bertekê li hemberê raber bike. Ev jî ji aliyê zagonan de, li ba me tê wateya tawanbariyeke mezin. Heta ger rewşenbîr dixwaze pêş ve here û bije, neçar e ku vî zemînî terk bike. Zagon, hemû saziyên wê, ya herî girîng jî hêzên ewlekariya wê fersend nadin ku rewşenbîr gotineke piçûcik jî bike û wî tînin ber xala "vê nêvengê terk bike!" Ya yek-du gotinan dibêje, yan jî nabêje. Ger bibêje jî, pir çelexwarî, diqewêre û hindek bi gora pergalê dibêje. Encam, rasteqîna me dîsa di ciyê xwe de dimîne.

Her wiha ger em ji bo xwe qala ronahîbûn û rewşenbiriyê bikin, pêwîste ku çonayetiyeke wî ya şoreşvaniyê hebe.

Ger hatina halê takekesê serhildêr pêk neyê, mirov nikare bibe rewşenbîr.

Mînak em dikarin Îsmaîl Beşikçî, tevî ku ne Kurd e, weke rewşenbîrekî Kurdistanê binirxînin. Xwest ku bi gor rasteqîna me ya civakî hindek azad birame. Bi rastî jî xwest ku di vî zemînê de birame.

Va, li rastê ye.

Rewşenbîr, di nav me de kom û civata civakî ya herî metirsîdar diderbirîne (îfade dike).

Tê wateya takekesê ku wijdana xwe pir erzan firotiye. Ez ji vê re di wateya rastîn de nabêjim rewşenbîr, dibêjim ê sexte ango “*rewşenbîrê*” ku li ser navê pergala mêtîngeriyê şikestiye. Lewma ev tîp rewşenbîr êşê ranabihîse, îro ji hêzên hevkarmend jî wêdetir, mirovê vala ye.

Vala...

Di bilêvkirina rastînê de vala ye. Lê civakê bêzanebûn hiştinê de pir metirsîdar e. Di hundirê hevkarmendiya jîrêkatiyî (entelektuelî) de ye. Warê jîrekatiyî û giyanî jahrî dike, bêyî ku pê bihese, destekeke mezin berpêşî temsîlkarên pergala zilmê dike. Pêwîstî heye ku rewşenbîr, bi vî rengî tûşî rexneyê were kirin.

Sedemeke vê jî, di bingeh de rewşenbîr berjewendiyên xwe di saziyên mêtîngeriyê de dibîne. Naxwaze ku vî zemînî bişikîne. Tiştekî ku Kurd bidê nîne. Jixwe rasteqîna gelekî ku hatiye bêdengkirin, her wiha sazî, viyan û berjewendiyekî ku karibe pêşkeş bike jî nîne.

Ji ber ku rewşenbîr hindek burjûvayê piçûk e, li benda berjewendiyê dimîne. Ew jî di Kurdan de nîne. Saziyeke ku karibe bi Kurdistanê ve têkildar berjewendiyê pêşkeş bike nîne. Ji ber vê yekê rewşenbîr ji vir direve û ji wan ezbeniyên xwe yên ku dilsozê wan e, hetanî dawiyê xizmetê dike. Ji ber vê yekê, li ser bingehê rastîna welatê me, qalkirina ronahîbûnekê pir zor e. Ger bibe, dê bi şêwaza şoreşgerî be û her tiştî bigre berçav. Jixwe yên ku vê dikin, em in ku hindek di zemînê şoreşgerî de bi rê ve diçin.

Ên ku weke rewşenbîr xwe dihesibînin, ji gihandina rastîna gel wêdetir, di hundirê nêvengeke bêtalox de ne ku, di radeyeke dawî de hatine çelexwarîkirin û ji çavên dil û

ramanê hatine pêmenkirin. Demagojîk in û ji ber ku pêwendiya zimanê wan bi rastînan re tune ye vê metirsiyê zêdetir dike. Lê zimanê wî rewşenbîrê ku pêwendiya xwe bi rastînê re tune ye; barkêşê nexweşiyên jîrekatî û giyanî ye û weke ku tê hizirkirin jê zêditir pêwîstî bi hilkolînê heye.

Di me de ku hestên pîroz pêş nakevin, takekes û her ku diçe rastîna civakê dernakeve rastê, têkiliya xwe bi vê rewişta (karekter) rewşenbîr ve heye û ev şûngeha rewşenbîr ku li ser navê dijmin barkêş, xapînok û çelexwarî ye, pirsgirêkeke mezin çêdike.

Şêwaza birêxistina şoreşa me; dê di destpêkê de hindek xizan, gundî, şivan, kedkar û komên civakê yên dîtir bi hilberînê re dahûrîne û dora dawî were rewşenbîr. Lê di vir de pêşketineke berevajî mijara gotinê ye. Rewşenbîr, ji ber ku yê herî di pêş de tayê berjewendiyên xwe pêş dixîne, hindek rewşengeriya xwe di destê yekem de bi saziyên mêtîngeriyê ve girê dide, vê yekê bi dexesiyê (hesudî) dike û vir weke yekane çavkaniya jiyanê dibîne.

Beriya ku romana Kurd were nivîsandin, dê were jiyîn.

Ger jiyîneke tirsnak pêk neyê, di me de nivîsandina romanê ne gengaz e. Bi vî aliyê xwe ve, bi gor pêvajoyên şoreşgerî yên weke şoreşa Fransî û şoreşa Rûsî şûngeheke xwe ya berevajî heye. Ew şoreş girêdayî ronahîbûneke çend sed salan û dahûrandineke (tehlîl) teorîk e. Di şoreşa Fransî de çerxa ronahîbûna bijare û ji beriya wê jî ronesans heye. Dîsa nifşa wêjevanên mezintirîn mijara gotinê ye. Ew rengdana şoreşê ya di demeke kurt de, weke pratîkî hatiye dahûrandin. Lê xwe dispêre zemînekî pir xurt. Zemînê dîrokî, civakî û rewşenbîrî pir xurt e. Bi çend serhildanan

encamên pratîk tên wergirtin. Şoreşa Rûs jî xwedî taybetmendiyên cewaz in. Hema bibêje beriya sedsalê xwedî amadekarî û nifşê wêjevanên mezintirîn e. Dema ku Çernîşevskî dahûrandina yekem a feodalî û koletiyê da çêkirin, Lenîn jî tê de, hemû wêjevanên Rûs ev weke palpiştiya herî mezin dîtin. Di şoreşa Çinê de jî, dîrokeke xurt û hêza wêjeyî-ramyarî ya Çînê heye.

Vaye, dema ku em tên rastîna Kurdistanê, kar vedigere berevajiyê. Her tişt hatiye wêrankirin. Çi tevgerên ronahîbûnê ku tu karibî xwe bispêriyê tune ye. Berevajî bi destên faşîzma serdestiyê têgîn û saziyên Rojavayî ku tê veguhastin Enedolê, hemû jêrsazî û jorsaziya komarê, ji bo rastîna Kurd û hebûniyên çandî yên li Enedolê, ew tevgera wêrankirin û tunekirinê ye. Raman û saziyên Rojavayî ber bi wan ve veguhastin û nasdarîkirin ne, wê hêza ku jê re hatiye dayîn bi kar tîne û ji holê radike. Bi vî awayî çespandineke berevajî ya metirsîdar li rastê peyda ye.

Çawa ku me têgîneke "Çawa Bijîn" avêtibe rastê, ev yek ji bo rewşenbîr jî derbasdar e.

Pêwîst e bersivên çawanî jiyîna rewşenbîr werin pêşxistin.

Ger em dixwazin rewşenbîr derxînin rastê, ev pirs pir girîng e. Di bingehê bêgaviyan de rewşenbîrî nabe. Da ku rewşenbîrî pêk bê, bijartineke azad a di lehê saziyên mêtîngerî de, ger hebe hindek bawerî û zanebûna te, xwe ji bo zemînê civakî pêk bîne. Dê bi zextê nebe. Ji ber ku ciyê rewşenbîr lê peyda dibe, zext nabe. Ger hebe jî, dê bi misogerî li dijî derkeve.

Vaye, di vir de rewşenbîr pêwîst e xwe bi her alî ve biçek bike. Bi wateya bêteşe bêyî xwe biçekirinê rewşenbîrî pêk nayê.

Asta ronahîbûnê nehatiye wergirtin.

Ronahîbûna rastînî dikare di zemînê gerîla de pêş bikeve. Ev jî karekî pir xweser û karê hewldanên ponijînê ye.

Em dikarin ji vê re bibêjin ronahîbûna çekê. Her wekî ku çek dide ronahîkirin, pêwîst e çek jî were ronahîkirin. Vêga di nava me de çek hindek tarî ye, bi rengekî ku pêşî hatiye ronahîkirin naxebite. Her wiha tam li hedefê nade. Teşeyên din ên biçekbûnê jî pêwîst in.

## Wêje Hîmê Giyanê ye

Şoreşa ku di jorsaziyê de dest pê dike, her wiha jêrsaziya xwe rastî veguherînê tîne, bi pêş dikeve û tekûz (bêqisur) dibe. Di vê derê de pirsa herî girîng ku divê were bersivandin ev e: Erka wêjeyê çi ye? Ango pêwîst e bi giştî huner, bi taybet jî wêje û dîsa ew romana ku beşek girîng a vê yekê ye, bi pirsa ka erka şoreşî çi ye, ku em bibersivînin. Ger huner nebe em nikarin qala (behs) civakan bikin. Lewma huner, amrazekî (alet) jêneger e, ji bo civakbûyîn û pêşketina civakî. Bi taybetî, ji ber ku mirov nêzîkatiya xwe ya li hember xwezayê bi zanistî û bi polîtîkayê tam nikare dahûrîne û nikare giyana xwe bi têrbûyîneke daringî (madî) têr bike, wî ber bi teşeyê têrbûyîbûneke cewaz, yanî ber bi hunerê ve dibe. Di vê wateyê de huner, derbaskirina pêdiviya giyanê esas digre. Bêguman pêwendiya vê bi raman ve heye. Bi hêsanî mirov dikare diyar bike ku huner, warekî pir xweser diderbirîne.

Gelek teşeyên curbecur ku xwestekên giyanî di nava xwe de peyda dikin, weke berhemên hunerî derdikevin pêş me û her wiha têrbûyîna arişî (manevî) pêk tînin. Berhemên pergalê jî dem bi dem hunerê bandor dikin. Dîsa pêşketina polîtîk jî pir nêzîk ve pêwendiya xwe bi huner re dide avakirin. Lê ji van tevan re em nikarin bibêjin huner. Di aliyê din de, di polîtîka û aboriyê de mirov dikare qala hunerê bike. Gelek bîrdoziyên curbecur nêzîkê huner dibin, di vir de ya were fêmkirin ev e ku; huner ji faktorên civakî yên din zêde bandorê digre, lê bi wan re nabe yek, ango dibe siyeke wan a pasîf. Lê belê weke pêdiviyeke çist (lezgîn) û jêveneger jiyîn û hîskirina wê mijara gotinê ye.

Dikare were gotin ku jiyan, li gor pêdiviyên mirovatiyê tên şekilkirin, di vir de tevahî amraz û azînên ku tên dîtin, dikevin berfirehiya hunerê. Bûyera ku em dibêjin dengekî xweşik, dimena bi çav xweş tê, helbest ango destana baş a ku hîtabê giyanê dike, weke cureyekî hunerê tê nirxandin. Dibe ku ev tunebin jî jiyan bidome, lê ev yek razberkirinek e. Di her nihêrtinê de heman veqetandina xweşikbûn û kirêtiyê heye. Dîsa di her nêzîkatiya giyana mirov de tiştên ku li xweşê diçin û naçin hene. Libat û tevgerîna baş heye, libat û tevgerîna şaş heye. Lewma Civakek an jî takekes her çendê ku bilind dibe (bi taybetî dema ku çalaktiyên hunerê dibe mijara gotinê) ku pêşketin hatibe pêkînandin, yek jî di vî aliyê de dibe derbirîna pêşveçûyînê. Yekî ku di nava teşeyê hunera pir paş de maye ango di nava teşeyê libata pir paşdemayî de seyr dike û diçe, qalî hovebertiya wî tê kirin. Kesayeta ku kûrbûna giyanê û dewlemendiyê bi xwe re peyda nake, ji mûzîk, dîmen û bi her awayî teşeyên libata huneriyên cûrbecûr ve bandor nabe û nakeve ferqa ve yekê, rehên jiyana wî ziwa bûne. Lewma huner, erka xwe ya civakî bêgotûbêj e. Bêyî wê jiyan tenê dikare nêzîkê jiyaneke ajalî seyr bike. Sînorê ku ajal, bi mirovatiyê re dibe yek, dikare biderbirîne. Ev, ne jiyaneke ku were pejirandine.

Bi vê wateyê di her qonaxa pêşketina civakî û pêngavên çonayetî de rasteriya pêşketinê ya hatiye pêkînandin, di heman demê de rasteriya (rasteqînî) pêşketina hunerê jî dide diyarkirin. Jixwe qonaxên civakî yên serûbinbûnên girîng, di heman demê de bi hewldanên hunerê ve darîçav dibin. Her serûbinbûyîn di destpêkê de li warê hunerê pêş dikeve; hem hunerê bandor dike, hem jî jê bandorê digre. Bi taybetî

qonaxên şoreşî, weke ku bi hunerê tên amadekirin, di gihandina teşeyên çonayetî û xurt de bandorekî girîng çêdikin. Huner bi vê wateyê li hember zoriyên jiyanê henase wergirtineke fireh e. Yanî ew giyana mirov a ku teng bûye, bi hemû behremendiya seheka (hîskarî) xwe ve firehkirin e. Bi tiştên heyî û kevin qîm nekirin e. Qîmpênanîna wê jî, hêz qezenckirin e. Dikare pênasa şoreşa hunerî wisa were çêkirin.

Civak û welatê Kurdistan dema ku dibe mijara gotinê, bi pênaseya giştî ya guncîn a hunerê tişta ku dikare were gotin, tevahîtiya civakê di mercên feodal û mêtîngeriyê de hatiye rewşekê ku nikare henase wergire û xwe bide pêşxistin û ev yek jî, li ser hunerê bandorekî pir neyênî çêdike. Lê belê di vir de ya herî girîng ev e: Gel, di gelek dezgehbûnên jorsaziyê, têkilî û hêzan de tevî ku pir zorayî kişandiye ango hatiye qedandin, lê sînordar be jî, xwe tenê bi huner dikare bide jiyandin, dîsa derbirîna nasnameya xwe dikare tenê bi hunerê bidomîne. Em vê yekê dibînin. Ev yek jî hêza huner nîşan dide. Huner dibe taybetmendiyeke civakî ya ku belkî jî dawî bin bikeve û were wendakirin.

## Mêtîngerî Hunerê Jî Înkar Dike

Mêtîngerî, di heman demê de ji bo pekanîna qirkirina hunerê pîvankariyeke mezin nîşan dide. Qirkirinên di her astê de ku li Kurdistanê hatine pêkînandin, di rêjeyeke (oran) giring de qirkirina hunerê jî pêk aniye. Lê huner, ji ber ku hindek bi giyanê ve girêdayî ye pir û bêtir zindî ye, di nava kategoriya yên dijîn de cî digre û aliyê xwe yê manewî de giraniyê dide çêkirin, ew qirkirinên ku di şertên daringî (madî) de pêk tên, qasî wan qirkinê napejirîne, ango vala derdixe. Huner, xwedî taybetmendiyekê wisa ye jî.

Lewma civaka Kurd, rasteqîn û nasnameya xwe ya gel kêm zêde bi hunerê berdewam kiriye. Bi taybetî folklor û mûzîk bûne sebeb ku nasnameya netew di rewşeke diyarî de xwe li ser piya bihêle. Lê gelek alî û çalaktiya hunerê hatine parçekirin û rastî pişaftinê hatine. Her wiha ji bo hunera netewa serdest bûye amrazekî bikaranînê.

Serdestiya mêtîngerî, di heman demê de serdestiya hunerî ye jî. Ev yek jî derbirîna xwe, destpêkê di nejiyandina rastîna hunera gel, tewişandin (parçekirin), ji xwe re malkirin û anîna halê nenasînê û piştre jî hunera xwe weke hunera ku ya gelê bindest e, di vê nêzîkatiya nîşandanê de peyda dike. Dîsa mêtîngerî di hemû dezgehên fermî de, bi taybetî, li ser piştevaniya hêza dewletê, ji bo vê yekê şiringa cîhana giyan û hestên gelê bindest da ku baweriya “di bingeh de tu ji netewa serdest î, wek wî yî, nasnameyekê te yê cuda nîne’’ bide çêkirin, serdestiyeke mezintirîn pêş dixe. Her wiha netewa serdest di rêjeya (oran) ku xwe dide pejirandin de, tunekirina netewekê temam dibe. Bi vî rengî nasnameya netew wenda dibe û nasnameya netewa serdest

desthilat dibe. Bi rastî jî ev, di rasteqîna Kurd de rewşeke herî pêş ketiye. Ji ber vê sedemê, li hember rasteqîna netewa serdest berxwedaneke pir hindik heye. Tebî ev yek nîşan dide ku mêtîngerî ka çiqas pêş ketiye.

Nexwe, têkoşîna li hember mêtîngeriyê di warê hunerî de piçûk nayê dîtin. Dîsa di warê huner de pir bi sînor be jî, hebûna nasnameya netewî di hinek aliyan de domandin dikare bingehekê çêbike, ji bo derketineke girîng di têkoşina rizgariya netew de. Di qonaxên destpêkê de bi taybetî, xebata çand û hunerî piştgiriyekê ji netewbûn û têkoşîna netew re dide çêkirin. Heya qonaxeke diyar roleke girîng dilêyîze. Lê heke ku şîdeta siyasî û leşkerî nebe, têkoşîna çandî û hunerî zêde wateyekê naderbirîne û zelal tê dîtin ku erka xwe nikare bide temamkirin.

Mirov dikare qala nêzîkatiya rewşenbîr û mîliyetperestiya hoveber ku di vê wateyê de huner rast nanirxînin bike. Em baş dizanin ku huner, çand û xebata wêjeyê ya ketûber bi rizgariya netewî, bi taybetî jî bi peywirên siyasî û leşkerî têkilhev dikin ango bi vî rengî naxwazin peywirên xwe bibînin, mafê hunerê jî nadin, ji lewra rê li ber tevlîhevkirinê vedikin.

Bi pêşketina têkoşîna me ya şoreşger ve hem erkdariya hunerê ya di nava şoreşê de hatiye zelalkirin, hem jî ew çemkên (feraset) çewt ên di nava şoreşê de neyêniya wan hatiye tehlîlkirin. Çawa ku giraniya pêwîst dike ji rola hunerê re hatibe dayîn, li hember karanîna helperestî (oportunîzm) jî, rexneyên pêwîst hatine pêşxistin. Ka çiqas ev yek rast e, di nava têkoşîna şoreşê ya bilindbûyî de pêşketina hunerî weke aşutekî mezin bûye, li ba vê yekê qasî

bandora warê hunerî li warê siyasî û leşkerî, van waran jî li ser warê hunerî bandoreke giran çêkirine. Di vê wateyê de çalaktiya hunerê hatiye gihandin bingehên rast ên erkdariya şoreşgerî. Ji destpêka sedsalê vir ve heta pêşiya wê jî, nasnameya netew a ku dihate xwestin xwe bigihîne asta hunerê, weke dêwekî hilperînê pêk aniye û ev tenê bi têkoşîna siyasî û leşkerî derketiye rastê. Lê, li ba vê yekê erkdariya hunerê kêm nebûye, tam berevajî zêde bûye. Her wisa ku şoreşa Kurdistanê serûbinbûneke girîng dije, şer ji hemû girseyan re bûye mal, xwe kûr dike, her çîn û tebeqeyî digre nava berfirehiya xwe, vê yekê didomîne, li ba vê yekê kêmbûyîna erkdariya hunerê bila li vir bimîne, em dibînin ku bêtir zêde bûye û hatiye halê pêdiviyeke şênber. Girseyên gel, bi mûzîk, folklor û wêneyên şoreşgerî bêtir hatiye rewşeke zindî û ji bo teşeyê jiyaneke baş hewl dide ku zêdetir xwe lêhatî bike. Yanî di vê wateyê de bi kiryarî şoreşeke hunerî tê jiyîn. Lê li rexmî vê diyar e ku, ev yek nayê terkeserkirina jixweberiyê, tam berevajî pir eşkere ye ku pêdiviya xeteke huner a pir rehdar û xebata wê ya pratîk heye. Her wiha ji bo derbaskirina kêmasiyên heyî mîna afirandina eniya hunerê û berê xwe dayîna xebateke wisa hem pêdivî ye, hem jî sehayek e ku ji pêşketina şoreşî re tevkariyekê çêdike.

**"Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hînî zimanê xwe yê dayikê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne?"**
**Ev hevok pir bi zelalî û eşkere ji me re nirx, wate û giraniya zimanê zikmakî diyar dike. Ger mirovek nikaribe bi zimanê xwe yê zikmakî biaxive û nikaribe zarokên xwe hînî zimanê xwe yê zikmakî bike, gelo ma wê demê çi wateya jiyana mirov dimîne. Ger mirov neçarî zimanekî din were hiştin, ji ber axivîna zimanê xwe yê zikmakî bi salan di girtigehan de birize, ma çawa dikare jiyana xwe bidomîne û watedar bike. Lewra ji bo watedarkirin û bi şanazî domandina jiyana xwe tekoşîna hebûnê hewce dike. Ev tekoşîn him ji bo azadiya axivîna bi zimanê xwe yê zikmakî, him ji bo hunandina wêjeya xwe ya bi zimanê xwe û him jî ji bo jiyîna bi çanda xwe ye. Gelo îro çend kes ji me Kurdan dikarin bi azadî bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin, binivisînin û bixwînin?**